



(ÎNCÎL)

Gospel of John in Kurmanji-Kurdish

**IGBV** 66304

© Gute Botschaft Verlag  
Postfach 80  
D-35673 Dillenburg

1994

**MIZGÎNIYA  
ÎSA MESÎH  
LI GORA YÛHENNA**

(ÎNCİL)

Gospel of John in Kurmanji-Kurdish

**IGBV** 66304

© Gute Botschaft Verlag  
Postfach 80  
D-35673 Dillenburg

1994

**IGBV**

**1** Destpêkê de Kêlam hebû. Kêlam tev Xudê bû û Kêlam Xudê bû. **2** Ew destpêkê de tev Xudê bû. **3** Her tîşt bî navber-tiya wê çêbû, qet tîştêk jî bê wê çênebû. **4** Heyat Wê de bû û heyat ronahîya insanan bû. **5** Ronahî lî tariyê de şewle dîde û tariyê Ew fêhm nekîr, (bîndest nekîr). **6** Mirovê ku aliyê Xudê'de hate şandin, Yehya (peyxamber) derket meydanê. **7** Ev zîlam jî bo şêhadet kîrînê hat; da jî ronahiyê re şêhadetî bîkîrana û herkes bî destê wî îman bîkîrana. **8** Ew bî xwe ne ronahî bû, lêbelê wî derbarê Nurê de şêhadetî kîr û jî bo vê yekê ew hate dînê. **9** Lê Nur'a hati dînê ya ku her insani ronahî dîke Nur'a heqîqî hebû. **10** Ew dînê de bû û dînê bî Wî hate hebûnê, feqet dînê Ew nas nekîr. **11** Ew hat cem yê xwe, feqet xelkê wî, (gelê wî) Ew qebûl nekîr. **12** Encax ew kesê ku îman bî Navê Wî anîn û Ew qebûl kîrîn, Wî heq da wan hemûyan ku ew bîbîn

zarokên Xudê. **13** Ew kes ne ji xwinê, ne ji irada bedenê û ne ji bî daxwaza insênin; encax ew ji Xudê welidin.

**14** Kelam bû insan û li nav me'de jiyin kir. Me ji tijibûna Wi ya bimbarek, merhemet û rasti ya Bav (yanê ya Xudê) û me bilindtîriya Lawê Xudê yê tenê dit. **15** (Hezretê) Yehya bo Wi şهادeti kir, gazi kir û wisa got: „Ewê ku dû min re tê, ji min mezintir, bilindtir e. Ji ber ku Ew ji beri min hebû, û yê ku min behsa Wi kir Ev e.“

**16** Me hemûyan ji tijibûna Wi de merhemet li ser merhemetê girt. **17** Şeriat bî destê (Hezretê) Mûsa hate dayinê, feqet lîtif, û heqîqet bî destê İsa Mesih hate dayinê.

**18** Qet insaneki tu caran Xudê neditiye. Feqet Lawê Wi'yê delal yê ku bî Xwe ji Xudê'ye û hemêza Xudê'de ye, Wi Xudê daye nas kîrin ê.

### **Hatina Yehya peyxamber**

**19-20** Dema ku, Yahûdiyan ji Qudsa Şerif xeberçi şandin ba Yehya jê pîrskîrin û gotin, tu ki yi? Wê çaxê Yehya wisa şهادeti

kir, wi aşkîre çise kir û inkar nekîr – „Ez Mesih ninim got.“

**21** Wê çaxê wan got, „lê tu ki yi? Tu İlyas î?“ Yehya got, „na“. Wan got, tu Ew Peyxamber î? Wi got, „na.“

**22** Wê çaxê şiyandîyan, (xeberçîyan) gotin ku, „ma naxwe tu ki yi? Ji me re bibêje ku em xeberê bîdin yê ku em şandine“. „Tu ji bo xwe çî dibêji?“

**23** Yehya (peyxamber) got ez ew dengim, ewê ku mina „Yeşaya (peyxamber) dibêje rê'ya Xudan rast, (dûz) bîkî, ew dengê ku çolê de bo wi bang dîke.“

**24-25** Hîn kesên Fêrisîyan ji Yehya're gotin, tu Mesih nîni, İlyas nîni û ew Peyxamber ji nîni, çîma tu vaftiz dîki?

**26** Yehya (peyxamber) wan re wisa got: „Ez bî avê vaftiz dîkim, feqet li nav we de yeki dîn heyê, yê ku hun nas nakî. **27** Yê ku li dû min re hat, Ew e. Ez laiç ninim ku bendê çarîxê Wi vebîkim.“ **28** Vana Hemû aliyê bajarê Şerîay li Bêtanyê'de, şuna ku Yehya (peyxamber) vaftiz kiribû li wê derê hatin çêbûnê.

## Berxê Xudê

**29** Rojek arê de derbaz bû, Yehya (peyxamber) dit ku Îsa ber bî wi hat û wi wisa got: „Mêze, Berxê Xudê yê ku gunehên dinê ji ortê heltine! **30** Yehya bo xwe got, li dû min re yeki din tê, Ew ji min hêjatir e. Ji ber ku yê min gote Ew ji beri min hebû ev Ew e, (yanê Îsa'ye). **31** Min Ew nas ne dikir, feqet bona ku Îsrail Wi nas bike min bî avê vaftiz kir û hatim.“ **32** Yehya (peyxamber) şehadeta xwe wisa domand (dewam) kir: „Min dit ku Rih'ê bimbarek ji jor'de mina gogerçinekê hate xwar û ser Îsa Mesih sekini. **33** Min Ew nas ne dikir. Feqet yê ku ez şandim ku bî avê vaftiz bikim, Wi got ku Rih'ê bimbarek li ser ki dayne û bisekine, yê ku bî Rih'ê bimbarek vaftiz bike, Ew e. **34** Min ji dit û şehadeti kir û got, Lawê Xudê Ev e.

## Şagirtên Îsa yên pêşi

**35** Dortira rojê Yehya peyxamber disa li tev du şagirtê xwe bû. **36** Îsa li wê derê're der-

baz bû, Yehya mêze Îsa kir û got, „Mêze Berxê Xudê!“

**37** Dema ku wan du şagirtan ev gotine bihistin, ew li dû Îsa çûn. **38** Îsa dema ku vegeriya, dit ku ew li dû wi tên. Îsa ji wan pirsî û got, „hun'î çî digerin?“

Wan ji ji Îsa re got: „Tu li kuderê rûdini Xudan?“ (yanê Rebbi) Mana Xudan, Mamoste ye.

**39** Îsa ji wan re wisa got, „Werin û bibinin.“ Ew li tev Îsa çûn û şuna ku Îsa rûdinişt ditin û wê rojê ba Îsa man. Saet wi çaxê çar bû. **40** Yê ku dengê Yehya (peyxamber) bihistin û li dû Îsa çûn, ew yek birayê Simon Petrûs, Andrêya bû. **41** Andrêya beri birayê xwe Simon dit û jê re got, „Me Mesih dit.“ (Mana Mesih mesh kîrin e)

**42** Andrêya biray xwe bir cem Îsa. Îsa mêze wi kir, ji wi re got, „Tu lawê Yûhenna Simon i. Dû vê rojê re navê te Kifas e.“ (Mana Kifas zinar e).

**43** Dortira rojê Îsa niyet kir ku, biçe bajarê Celilê. Wi mirovek dit navê wi Filipûs bû û Îsa, Filipûs re got, „li dû min were.“

**44** Filipûs ji bajarê Andrêya û Petrûs bû ji

bajarê Bêtseyda. **45** Filipûs Natanyel dit û jê re got, „Ewê ku Mûsa (peyxamber) derbarê wi de nivisiye Şeriatê de û yê ku peyxamberan ji behsa wi kîrîne, Lawê Ûsiv, Îsa’y Nîsreti me dit.“

**46** Natanyel, ji Filipûs pîrs kir û got: „Ji bajarê Nîsretê tişteke rind, (qenc) derdikeve?“ Filipûs got, „Were û bibin e.“

**47** Îsa, dit ku Natanyêl ber bi Wi hat, wê çaxê ji bo wi wisa got, „Mêze, Îsrail kê heqiqî! Lî dîlê wi de hîle tune.“

**48** Natanyel got, „Tu min ji kû nas diki?“ Îsa, got: „Wexta ku Filipûs hê bang te nekîribû, min tu bin dara hêjîrê de diti.“ **49** Natanyel got, „Xudan, tu Lawê Xudê û padişahê Îsrail’î!“

**50** Îsa jê re got, „bona ku min ji te’re got min tu bin dara hêjîrê de diti, tu iman diki? Tê hê ji van tiştana girtir û mezintir tişt bibini.“ **51** Îsa got, Ez we re bi rasti bi rasti dibêjim, ezman vedibe û Milyaketên Xudê, lî ser Lawê insan de bîlînd dîbin û têne xwar; hun ji wi bibinin.“ (Mana Lawê insan, Îsa Mesih’e.)

## Mûciza Îsa ya pêşi

**2** Roja sîsêyan gunde kê bajarê Celilê de gundê Kana de dawatek hebû. Dayêka Îsa lî wê derê bû. **2** Îsa û şagirtên wi ji hatibûn dawet kîrî. **3** Wexta ku şerab xelas bû dayêka Îsa, ji wi re got, „Şerab xelas bû.“

**4** Îsa got, „Jinîk te çî ji min e? Saeta min hê nehatiye.“

**5** Dayêka Îsa, kesê ku xîzmet dîkîrî ji wan re got, „Îsa ji we re çî bêje wê bîkî.“ **6** Bo edeta paqîj bûna Yahûdîyan, lî wê derê şeş kûpên kevîr hebûn ku her kûpekê de heştê litîr heta sed û bist litîr av çîh dîbû.

**7** Îsa ji xîzmetçîyanre got, „Kûpan bi avê tîji bîkî.“ Wan kûp heta lêvîka re tîji kîrî.

**8** Îsa dû re ji xîzmetçîyanre got, „niha ji ji vîna bîgîrî û ji serdarê dawetê re bîbî.“

Wan ji bîrî. **9-10** Serdarê dawetê ew ava ku bû şerab tam kîr. Wi ne zani ku ew şerab ji kû hatiye, feqet xîzmetçîyê ku av ji kûp de derxistibûn, wan dîzaniya. Serdarê dawetê bang zava kîr û got, „xelk pêşi şeraba rînd dîde, dema ku zehf vexwarî, ya ne rînd

dide. Feqet te şeraba rınd heta nıha hılandıye.“

**11** İsa ev mûciza xwe ya pêşi dı gundeke bajarê Celilê de, dı gundê Kana de çêkir û qudreta xwe nişan da. Şagirtên Wi ji iman bı Wi anin.

### **İsa tucaran ji ibadetxanê dıke der**

**12** Dû wê rojê re, (jû pê ve re) İsa, dayêka İsa, bırayên wi û şagirtên Wi bı hev re çûn Kefernahumê û çend rojan lı wê derê man.

**13** İda Yahûdiyan ya derbazbûnê, (yanê ya pasoxê) ji nêzik dıbû. İsa ji çû Qudsa Şerifê. **14** Lı wê derê dewar, mih û lı tev yên ku gogerçin dıfırotın (tucar) rûniştıbûn û pere hûr dıkırın. İsa ji ew dıtın. **15** Wi ji bendıkan qamçıyek çêkir hemû, tev dewar û mihên wan ji wê kır der, yên ku pere hûr dıkırın perên wan rijand maseyên wan ji gêr kır. **16** Yên ku gogerçin dıfırotın, İsa ji wan re got, „vana ji vê derê ra bıkın, mala Bavê mın nekın malek ya ticaretê!“

**17** Wê demê şagirtên wi ew yeka ku (kıtıba bımbarek) de hatiye nıvisin anin bira xwe

„Xireta ku mın ji bo mala te kır, mın dıxwe xılas dıke.“ **18** Yahûdiyan ji İsa pırs kırın, „Madem ku tu va tıştan çêdıkı, tu mûcizekê çawa nişanê me bıdı?“

**19** İsa wısa got: „Vê İbadetxanê hılşının, ez wê sê rojan de disa çêbıkım.“

**20** Yahûdiyan, İsa re gotın, „Ev ibadetxane çel û şeş salan de hate çêkırın, ma tu wêna sê rojan de çêdıkı?“

**21** Feqet İbadetxana ku İsa got, ew bedena wi bû. **22** Dema ku İsa ji mırınê ra bû, şagirtên wi ev gotine, anin bira xwe û iman bı Kelama İsa û bı nıvisên bımbarek anin.

**23** Bajarê Qudsa Şerif de dema cejna (ıda) derbazbûnê de İsa zehf mûcize çêkir û ew kesên ku ev mûcize dıtın, iman bı Navê İsa anin.

**24** Feqet ji ber ku İsa dilê hemû insanan nas dıkir, bı wan baweri nedıkir. **25** Derbarê insan de qet ihtıyac tıne bû ku yeki ji İsa re tışte bigota. Jıber ku wi tıştê dilê insan de derbaz dıbûn dızaniya.

**3** 1-2 Serdarek yê Yahûdiyan bı navê Nikodim de hebû. Ev mirov Fêrisi bû, (yanê mirovekê ilmdar bû), ew şevêkê hate cem Îsa û ji wi're got, „Xudan, em dızanin ku tu mamoste yi û Xudê tu şandıyi. Jiber ku eger Xudê li tevê nebe, qet kesek nıkare van mûcizeyên ku tu çêdiki, çêbike.“

**3** Îsa ji wi re wisa got: „Ez ji te re bı rasti bı rasti dibêjim, heta ku insanek ji nû ve newelide nıkare padişahiya Xudê bıbine.“

**4** Nikodim, jê pırs kır, „Mirovê ku kal (êxtıyar) bûye çawa dikare ji nû ve bıwelıde? Dıkare ku dısa bıkeve rehma, (yanê zıkê) dayêka xwe û dısa were dınê?“

**5** Îsa wisa got: „Jı te re bı rasti bı rasti dibêjim, heta ku insanek ji avê û ji rıh de newelide, nıkare ku bıkeve padişahiya Xudê. **6** Yên ku ji bedenê welidine beden in û yên ku ji Rıh welidine Rıh in. **7** Şaş nebe ku, mın ji te're got hun gerek ji nû ve bıwelıdın. **8** Ba kijan aliyê de bıxwaze wisa tê; tu dengê wê dıkari bıbıhizi, feqet ji kû ve tê û diçe kû derê tu wê nızani. Hemû kesê ku Rıh'de welidine ji wısane.“

**9** Nikodim ji Îsa pırs kır û got: „Vana çawa

dıkarın çêbın?“ **10** Îsa ji wi re wisa got: „Tu mamosteyê Îsrail i û dısa ji tu van tıştan fehm naki?“ **11** Te re bı rasti bı rasti dibêjim, em tıştê ku dızanin dibêjin û tıştê ku me dit wan şehadet dıkin û hun şehadetiya me qebûl nakın. **12** Dema ku mın ji we re behsa tıştê dınê kır we iman nekır, wê çaxê eger ez behsa tıştê ezmani bıkim hunê çawa iman bıkın? **13** Jı xeyri Lawê İnsan yê ku ji ezman hatiye xwar qet kesek derneketiye ezmanan. **14** Çawa Mûsa (peyxamber) dı çolê de mar bılınd kır, gerek Lawê İnsan, (yanê Îsa) ji wisa bılınd bıbe jor. **15** Wisa ku, hemû kesê ku iman bı Wi bınin, bıgihijn heyata, (yanê jiyana) abedin.

**16.** Çımki Xudê evqas pır (zehf) hez ji dınê kır ku, Lawê xwe yê delal û tenê da, (yanê feda kır). Wisa ku, yên iman bı Wi bınin qet kesek ji wan mehf nebin, feqet hemû bıgihên jiyana abedin. **17** Xudê Lawê xwe neşand dınê ku, ew hukum li dınê bıke, Ew şand ku dınê bı wi xılas bıbe. **18** Ew kesê ku iman bı Wi bınin mehkum nabın; feqet yê ku iman bı Wi nekırın, ew ji xwe hatine hukum kırın. Jiber ku iman bı navê



Lawê Xudê'yê delal û tenê nekırine. **19** Hukum ji ev e: Ronahi hat dinê, feqet insanan ji ronahiyê zêdetır ji tariyê hezkırın. Jıber ku xebatên wan xırab bûn. **20** Her ki xırabiyê dıke, ji ronahiyê nefret dıke da ji bo ku xebatên wi eyb nebın ne werın ronahiyê. **21** Feqet yê ku xebatên wi rındın ji bo ku xebatên wi xuya bıkın, ku wi bı Xudê re kırıye ew tê ronahiyê.

### Şehadet kırına Yehya (peyxamber)

**22** Pışti vê yekê İsa û şagirtên xwe hatın diyarê Yahûdiyê. İsa midetkê lı tev wan lı wê derê dıma û vaftiz dıkır. **23** Yehya (peyxamber) ji nêzıkê Salimê, bajarê Aynonê de vaftiz dıkır. Çımki lı wê derê zehf av hebû. İnsan dıhatın û vaftiz dıbûn. **24** Yehya (peyxamber) hê nehata heps kırın. **25** Wê sırê de navbera şagirtên Yehya (peyxamber) û Yahûdikê de derbarê paqij bûnê de gengeşi derket. **26** Şagirtên Yehya (peyxamber) hatın ba Yehya û gotın „Mamos-ta“, „Yê ku aliyê çemê Şerıay de lı tev te bû, yê ku te derbarê Wi de şehadeti kır, va

ye ew mırov vaftiz dıke û herkes ji tere ba Wi.“ (Wan ev bo İsa Mesih got).

**27** Yehya (peyxamber) wısa got: „Dema ku jorde, (yanê ji aliyê Xudê'de) tışteq neye dayın, kesek nıkare tışteqê bistine. **28** Mın got ez Mesih ninım, lêbelê ez xeberçiyê Wi me û hun ji şehidê van gotinê mın in. **29** Bûk ya kê ye, zava ji Ew e. Lêbelê yê ku ba zava dısekine, dostê zavê ye û dema ku ew dengê zava dıbihize, zehf kêfxweş dıbe. Eşqa mın ji bı vi awayi hat tamam kırın. **30** Ew gerek mezın bıbe û ez ji piçûk bıbım. **31** Yê ku jor de hatiye xwar, ji herkesê bılındtır e. Yê ku ji dinê ye dınyewi ye û behsa, (qala) dinê dıke. Yê ku ji ezmin de hatiye xwar, lı ser herkesire ye. **32** Wi çı ditiye û çı bıhistiye ji wi re şehadeti dıke, lê belê şehadeti ya wi kes qebûl nake. **33** Yê ku şehadeti ya Wi qebûl dıkın, wan erê kımırine ku Xudê heqıqet e, (rastiye). **34** Ew kesê ku Xudê şandıye, Ew gotinên Xudê dıbêje. Çımki Xudê, Rıh bı pivandinê nade. **35** Bav, Law hez dıke û her tışt daye dest Wi. **36** Yê ku iman bı Law bine jıyana wi ya abedin heyê. Lê belê yê ku imanê bı Law

neke ew jiyane nabine lê belê xezeba Xudê li ser wi dimine.

**4** **1-3** Fênsiyên bîhistin ku Îsa ji Yehya (peyxamber) zîdetir şagirtan qezenc dike û vaftiz dike. Hal bû ku Îsa bi xwe vaftiz nedikir, şagirtên Wi vaftiz dikirin. Dema ku Îsa ev zani ji Yahûdiyê weqetiya û disa çû bajarê Celilê. **4** Û lazîm bû ku ew li nav bajarê Semiriyê re derbaz bibûya. **5** Bi vi awayî hat bajarki Semiriyê navê wi Sihar bû. Ew der nêzikê erdê Ûsiv (peyxamber) bû ew erdê ku bavê wi, Yaqub (peyxamber) dabû wi. **6** Bira (Qûya) Yaqub (peyxamber) ji li wêderê bû. Bona ku Îsa rêwitiyê de westayi bû, cem birê rûnişt. Saet ji devdevî diwazdeh bû. **7** Jinik ji Semiriyê hat ku avê bikişîne. Îsa ji wê re got, „avê bide min, ez vexwim.“ **8** Şagirtên Îsa ji bo kirina xwarinê çûbûn bajêr. **9** Jinika Semiriyê ji Îsa re got, „Tu Yahûdi û ez ji jinikek Semiriyî me, bi çî awayî tu ji min avê dixwazi?“ Çimki eleqadar kê Yahûdi ji xelkê Semiriyê re tune. **10** Îsa ji jinikê re wisa got: „Eger ku te xela-

ta Xudê û yê ku ji te re dibêje avê bide min nas bikirina û bizanina yê ku li tev te qise dike, ki ye, te wê ji Wi av bixwasta, Wi ji wê ava jiyane bîdana te.“

**11** Jinik got, „Efendi“, „te re tiştê ku tu pê avê bikişini tune û bir ji kûr e; ji kû derê ava jiyane bi te re heye? **12** Ma tu ji kalikê me Yaqub peyxamber mezintir î? Wi ev bir daye me, bi tev law û dewarên xwe ji ji vê avê vexwarin.“

**13** Îsa wisa got: „Ki ji vê avê vexwe, ew disa ti dibê. **14** Feqet ki wê ava ku ez bîdim vexwe tu caran ti nabe. Ava ku ez bîdim di hundurê wi de ji bo jiyana abedin dibê kaniya ku diherike.“

**15** Jinikê got „Efendi“, „vê avê bide min ku ez ne ti bibim û ne ji bona av kişandinê heta bi vê derê werim.“

**16** Îsa, jinikê re got, „here gazi mêrê xwe bike û were vê derê.“

**17** Jinikê got: „Mêrê min tune.“ Îsa ji jinikê re wisa got, „bona ku te got mêrê min tune, te rast qise kir. **18** Çimki, „Tu bi pênc mêran re zewiciyi. Ev mêrê ku tu niha tevê dîsekini ji mêrê te nine. Te rasti got.“

19 Jinikê ji Îsa re got: „Efendi, ez dibinim ku Tu peyxamber i. 20 Kalikên me li vi çiya de ibadet kîrin, û hun dibêjin ku şundê ibadet kîrinê Qudsa Şerif e.“

21 Îsa ji wê re wisa got: „Jinikê, bawer bi min bike, saet tê ku, Bav re (yanê Xudê re) ne li wi çiyayi û ne ji li Qudsa Şerif de hun ibadet bikin! 22 Hun ibadet dikin û nîzanin ku ji ki re, em ibadet dikin û zanin ku ji ki re dikin. Çimki xilasi ji Yahûdiyan e. 23 Lê belê yên ku Bav re, (yanê Xudê're) ji dil ibadetê rih'de û heqîqetê de dikin ew saeta tê û ew saet niha ye. Bav ji li wan digere yên ku wisa ibadetê jê re dikin. 24 Xudê Rih e, ew kesê ku ji wi re ibadet dikin ji gerek bi rih û bi heqîqetê bikin.“

25 Jinikê ji Îsa re got, „Mesih yê ku hatiye mesh kîrinê, ez zanim ku ew wê were, û Ew wê derbarê her tiştê de xeberê bide me.“ 26 Îsa got, yê ku bi te re qise dîke ez, Ew im; (yanê Mesih Ez'im got!)

27 Wê demê şagirtên Îsa hatin. Ji ber ku Îsa bi jinikekê re qise dikir ew şaş man. Lê bele disa ji qet kesi, „Îsa re negot ku tu çi

dixwazi?“ an ji, „Tu çima bi wê jinikê re qise diki?“

28-29 Dû re jinikê kûzê avê cih hişt çû bajêr û xelkê re wisa got: „Werin, mirovê ku her tiştê ku min kiriye ji min re got binin. Ecêba Mesih Ev e?“ 30 Xelk ji bajêr derket dest pê kîrin û berbî Îsa hatin.

31 Wi çaxê şagirtên Îsa, rîca kîrin û gotin, „Xudan, nan bixwe!“

32 Ema Îsa got, „Xwarinek min heye, hun wê nas nakin.“

33 Şagirtan ji hevûdu pîrs kîrin û gotin: „Ecêba kesi ji Wi re xwarin aniye?“

34 Îsa wan re got, „xwarina min ewe ku, xwastina yê ku ez şandim binim şunê û karê Wi temam bikim.“ 35 „Hun, nabêjin ekin çininê re hê çar meh hene? Va ye, ez ji we re dibêjim, serê xwe bilind bikin û mêze zeviyan bikin. Ekin zer bûne û çininê re hazir in! 36 Bona yê ku ajotiye û yê ku dîçine bi hev re dilgeş bibin, yê ku dîçine ucreta xwe digire û ji bo jiyana abedin ji ekinê top dîke.“ 37 Ew gotina ku, „Yek dajo û yeki din ji dîçine, di vê yekê de raste. 38 Min hun, bo çinina mehsûlek ku

we emeg ji bo wi xerc nekır şandin. Hine din emek dan, hun ji ketın nav emegê wan de.“

39 Dı wi bajari de gelek kesên Semiriyê li ser gotina jınikê ji ber ku wê şehadeti kır û got, „her tıştê ku mın kırıye İsa ji mın re got“ iman bı İsa anin. 40 Xelkê Semiriyê hatın cem İsa û jê rıca kırın ku Ew li cem wan bisekine. Ew ji li wê derê du rojan ma. 41 Ser soza wi hê gelek kesên dın ji hatın imanê.

42 Evana ji jınikê re digot: „Êdi sebeba imana me ne bı gotına te ye.“ „Me ji bı guhê xwe bıhist û em dızanın ku İsa xılas-karê dinê yê rast e (yê heqıqi ye.“)

### **İsa lawê memûr kê sax dıke**

43 Pışti van du rojan İsa ji wê derê weqetiya û çû Celilê. 44 İsa bı xwe, şehadeti kır ku, peyxamberek dı Welatê xwe'de ne bı qedr e. 45 Dema ku İsa hat bajarê Celilê, xelkê Ew rınd pêşwazi kır. Çımki ew ji çûbûn idê û her tıştê ku İsa dı Qudsa şerif de kırıbû wan ji ew ditıbûn.

46 İsa disa, hat gundê Kana yê bajarê Celilê şûna ku wi ji avê şerab çêkırıbû. Li wê derê memûrek yê Padişah hebû. Lawê wi Kefernahumê de nexweş bû. 47 Mırov, dema ku bıhist İsa ji Yehudiyê hat bajarê Celilê, çû cem İsa û jê rıca kır ku ew were lawê wi yê ku ber mırınêbû sax bıke.

48 Wê demê İsa ji wi memuri re got: „Hun heta alamet û nuwaze nebinın iman nakın.“

49 Memurê Padişah ji İsa re wısa got, „Efendi, ji beri ku lawê mın bımirre were xwar!“

50 İsa got, „Here, lawê te diji.“

Mırov iman bı gotına İsa anı û çû. 51 Dema ku ew hê rê de bû xulamên wi berbı wi hatın, xeber danê û gotın lawê te rınd (sax) bû. 52 Mırov ji wan pırs kır û got, lawê mın kijan saetê de rınd bû. Wan ji wısa got: „Duh nivro saet yeki de agirê wi daket.“

53 Bav fehmi kır ku, ew ew saeta ku İsa ji wi re gotıbû ku, „lawê te diji“ ew saete ye; û ew bı temamê xelkê mala xwe ve hatın imanê. 54 Dema İsa ji Yahûdiyê hat Celilê, ew mûciza diduyan bû ku Wi çêkır.

## İsa, kûdê hewzê de baş dîke

**5** Pişti van tiştan idek ya Yahûdiyan hebû û İsa çû Qudsa şerîfê. **2** Lî Qudsê de lî cem wi deriyê jê re deriyê miyan dahat gotin, hewzek hebû bî zîmanê İbrani jê re digotin Beythesta; pênc hewşên wi hebûn. **3-4** Lî wê derê kesên kor yê nê kûd yê falinc û komekê zêde ya nexwaşan radîzan. **5** Lî wê derê mirovek nexweş hebû ku si û heyşt sal bû ew nexweş bû. **6** İsa dit ku ew mirove lî wê derê razaye û İsa dîzani ku ew jî wexteke dirêj ve nexweş bû, jê pîrs kir û got: „Tu dixwazi baş bibî?“ **7** Wi mirovê nexweş wisa got: „Efendî, dema ku av pêl dîde (çelqîn dîke) kesê mî n tune ku mî n danin lî nav avê, dema ku ez dixwazim bîkevî mî n nav avê, jî berî mî n yê n dîn dîkevî mî n nav avê .“ **8** İsa jî wi re got, „Rabe doşeka xwe top bîke û bimeşe.“ **9** Ew mirov tam wê demê de baş bû û doşeka xwe top kir û meşiya. Ew roj roja septê bû. **10** Jî ber vê yekê Yahûdiyan jî wi mirovi re gotin, „iro roja Septê ye doşeka xwe top neke, çimki ew caiz nîne jî bo te.“

**11** Ewa mirov jî wan re wisa got: „Ew mirovê ku ez baş kirim, jî mî n re got, doşeka xwe top bîke û bimeşe.“

**12** Jê pîrs kirin û gotin, „mîrovê ku jî te re got doşeka xwe top bîke û bimeşe ki ye?“

**13** Mîrovê ku baş bûbû nezani ku Ew ki ye. Çimki ew der zehf sıxlet bû û İsa jî wê derê xwe dabû alîki. **14** İsa dû re ew mirov ibadetxanê de dit. Got, „mêze tu baş bûyi. Êdî guneh neke ku tiştêk hê xîrabtir neyê serê te.“

**15** Ew mirov çû ba Yahûdiyan û jî wan re got, ew mîrovê ku ez baş kirim İsa ye.

**16** Bona ku İsa roja Septê tiştên wisa çêkir Yahûdiyan zulum lî Wi kirin. **17** Feqet İsa jî wan re wisa got: „Bavê mî n heta nîha dixebite û Ez jî dixebitim.“

**18** Jî bo vê yekê Yahûdî hê pêtir bo kuştîna İsa dixebitin. Çimki İsa tenê bî xîrab kirîna roja Sebtê nema bû, lê wi got Xudê bavê mî n e û Wi wisa xwe jî bî Xudê re kir yek.

## İsa heyatê, (yanê jiyanê) dîde

**19** İsa jî Yahûdiyan re wisa got: „We re bî

rasti bı rasti dibêjim, gava ku Law kar û xebata Bav nebine bı xwe û xwe qet tiştê kê nıkare bıke. Bav çı bıke lav ji wê tiştê dıke. **20** Çımki Bav ji Law hezdıke û hemû xebata xwe nişanê Law dıde. Ber ku hun xwe şaş bıkın, Ew ji va tiştana gırtır tiştan nişanê wi bıde. **21** Bav, (yanê Xudê) çawa dıkare mıriyan rabıke û jıyanê bıde wan, Law ji wısa bo ki bıxwaze jıyanê dıde wan. **22** Bav kesi hukum nake, Wi hemû xebata hukum daye Law. **23** Wısa ku ew kesê ku Bav dıdın şeref kırın Law ji bıdın şeref kırınê. Yê ku şeref nadın Law, ew şeref nadın yê ku Law şandıye Bav ji (yanê Xudê ji). **24** „We re bı rasti bı rasti dibêjim, ew kesê ku gotınên mın bıbıhızın û iman bı yê ku ez şandıme binın jıyana wan ya abedin heye. Hukum ji kesên wısa nabe, lê ew ji mırinê derbazê jıyanê bın e. **25** We re bı rasti bı rasti dibêjim saet tê ku mıri wê dengê Lawê Xudê bıbıhızın û yê ku bıbıhızın ji wê bıjin û ew saet nıha ye. **26** Çımki çawa ku Bav de jıyan heye, Wi ev selahıyet daye Law ji. **27** Selahıyeta hukum kırınê ji daye Law. Çımki Ew Lawê İnsan e. **28** Ji bo vê

şaş nebın. Hemû kesê ku mezelê de ne dengê Wi bıbıhızın, ew saet tê. **29** Ê ew ji mezelên xwe derdıkevın der. Yê ku rındı kırıne bo jıyanê û yê ku xırabi kırıne ew ji bo hukum kırınê radıbın.“

### İsa re şehadeti

**30** İsa got: „Ez ji ber xwe nıkarım tu tiştê bıkıım. Ez çawa dibıhızım wısa hukum dıkım û hukmê mın ji raste. Çımki ez ne lı armanca xwe dıgerım, lê belê ez lı armanca yê ku ez şandıme dıgerım. **31** Eger ku ez bo xwe şehadeti bıkıım, şehadetiya mın rast nıne. **32** Feqet yeki dın heye ew ji bo mın şehadetiye dıke. Ez dızanıım şehadeta ku Ew ji bo mın dıke rast e. **33** We mırov şandıın ba Yehya (peyxamber) û wi ji heqı-qetê re şehadeti kır. **34** Lê belê şehadetiya ku mın qebûl kırı ne ji insanana, encax ji bo hûn xılas bıbın ez vana dibêjim. **35** Yehya (peyxamber), mına çıra kê vêketi, şewle dıde. We wxeste ku şewla wi de, (yanê ronahıya) wi de mıdet kê şabıbın. **36** Feqet şehadetek ya mın heye, ew ji ya

Yehya (peyxamber) hê mezintir e. Ev karên, (xebatê) ku ez dikim, yên ku Bav dane min, ew ji ji bo min şehadetiyê dikin, ku Bav ez şandim e. **37** Bav, Yê ku ez şandime, Wi ji bo min şehadeti kiriyê. We qet zeman kê ne dengê Wi bihist û ne ji şikilê Wi ditiye. **38** Kelama Wi di hundurê we de nasekine. Çimki hun iman bi yê ku Wi şandiye, nakin. **39** Hun Nivisên bimbarek dixwinin. Çimki hun zan dikin ku jiyana we ya abedin di wanda ye. Yên ku bo min şehadetiyê dikin ji ewin, (nivisên bimbarekin!) **40** Disa ji bo ku hun bigihên jiyana abedin, naxwazin ku werin cem min.

**41** „Ez meth kirina insanen qebûl nakim. **42** Feqet ez we dizanim, hundurê we de, (yanê dilê we de) hezkirina Xudê tune. **43** Ez bi navê Bavê xwe hatim, feqet hun min qebûl nakin. Eger ku yeki din bi navê xwe were, hunê wi qebûl bikin. **44** Hun meth kirinê ji hevûdu qebûl dikin, feqet li izeta ku ji Xudê'yê yek tê nagerin. Ma hun çawa dikarin iman bikin? **45** Zen nekîn ku ez we ba Bav sûcdar dikim. Yê we sûcdar dike Mûsa'ye, ewê ku we hêviya, (umêda) xwe bi wi

ve girêdaye. **46** Eger ku we iman bi Mûsa bikirana, we iman bi min ji bikirana. Çimki Mûsa derbarê Min de nivisiye. **47** Feqet dema ku hun iman bi nivisên Mûsa nekîn, ma hun çawa iman bi gotinê min bikin?“

### İsa pênc hezar kesi têr dike

(Met 14:13-21, Mer.6:30-44, Lûq.9:10-17)

**6** Dû van tiştan re İsa, derbazê aliyê gola Celilê – yanê Taberiyê bû. **2** Qerebalixek mezın li dû Wi dîçûn. Çimki wan mûcizeyên ku İsa bo nexwaşan çêdikir ditibûn. **3** İsa derket çiyê û tev şagirtên xwe li wê derê rûnişt. **4** Cejna Yahûdiyan ya derbazbûnê ji nêzik bû.

**5** İsa dema ku serê xwe rakir û dit qerebalixek insanen ya mezın pey wi tîn, Wi ji şagirtê xwe Filipûs re got, „Em ji kû derê nan binin ku em van têr bikin?“ **6** İsa bo ceribandina wi ev got, lê İsa bi xwe dîzaniya ku wê çî bikira.

**7** Filipûs ji İsa re wisa got: „Eger ku her yek ji wan hindik ji bixwe em bi du sed dinari nan bigirin disa ji nake der.“

**8-9** Şagırtek yê Wi, bırayê Simon Petrûs Andrêya, İsa re got ku: „Lı vır bı zarok kê re pênc nanê cehini û du masi hene. Ema bo va qas mirovan çı ne?“

**10** İsa got, „xelkê lı ser erdê bıdın rûniştın ê.“

Lı wê derê ji pır hêşınayi hebû. Bı vi awayi xelk hemû lı ser erdê rûnişt. Lı wê derê nêziki pênc hezar mêr hebûn. **11** İsa nan gırt, şıkır kır û dû re yên ku rûniştıbûn çıqas xwestın wi belav kır. Wi masi ji wisa belav kır. **12** Dema ku herkes têr bû İsa ji şagırtên xwe re got, „Nanê ku zêde, (yanê ber maye) top bıkın, wisa ku qet tıştek zıyan nebe.“

**13** Wan ew top kırın, bı wan bermayên wanên ku pênc nanên cehini xwarıbûn, bı wan qetikan dıwazdeh sepet tiji kırın.

**14** Dema ku xelkê mûciza ku İsa çêkır dit, wisa gotın: „Bı rasti ew Peyxamberê ku were dinê Ev e.“

**15** Bona ku İsa zaniya ew xelk wi bıbın û bı zor bıkın şah, tenê çû çiyê.

## İsa lı ser avê re dimeşe

(Met. 14:22-33, Mer 6:45-52)

**16** Dema ku êvar bû şagırtên İsa daketın ba golê. **17** Lı wê derê lı qayixê siwar bûn û hêla Kefernahumê re bı rê ketın; ew aliyê dın bû. Tari ketıbû ser erdê û İsa ji hê nehatıbû cem wan. **18** Dema ku bayek bihêz hat gol rabû. **19** Dema şagırtên İsa rê ya sê milan bêrik kışandın, wan dit ku İsa lı ser avê re dimeşe nêzikê qayixê bû, ber bı wan tê û ew tırsıyan. **20** Ema İsa ji wan re got, „Ez ım, netırsın!“ **21** Bı vi awayi wan xwest ku İsa bigırın qayixê. Wê gavê qayix gehişt şûna ku ew dıçûn ê.

**22** Dortıra rojê, ew kesê ku aliyê dın sekini bûn, wan ditın ku ber golê tenê qayixek hebû û İsa ji tev şagırtên xwe lı wê qayixê siwar nebûbûn û şagırtên wi tenê lı qayixê siwar bûbûn. **23** Şûna ku Xudan şıkır kır û dû re xelqê nan xwar, nêzikê wê derê lı Taberiyê qayixê dın ji hatın. **24** Dema ku xelkê dit İsa û şagırtên wi lı wê derê ninin ew lı qayıxan siwar bûn û aliyê Kefernahumê re çûn û lı İsa gerin. **25** Dema ku wan



Îsa wi aliyê golê ditin, jê pîrs kîrîn û gotin,  
„Xudan, tu kengê hati vîre?“

## Nanê jîyanê

**26** Îsa wisa got: „We re bî rasti bî rasti dibêjim, bona ku we mûcîze dit nine, bona ku we nan têr xwar bo wê yekê hun mîr digerin. **27** Bona xwarîna demi nine, bo xwarîna ku jîyana abedin de dîmine bo wê xebatê bîkîn. Vîna Lawê insan dîde we. (Yanê Îsa got, Ez bîdîm we.) Çîmkî Bav Xudê ev selahiyet daye wi.“

**28** Xelkê ji ev jê pîrs kîr: „Bona ku em xebata Xudê bîkîn, lazîme ku em çî bîkîn?“

**29** Îsa, ji wan re wisa got, „Xebata Xudê ewe ku, hun îman bî wi mîrovi binîn yê ku Xudê şandîye.“

**30** Ji bo vê yekê xelkê ji Îsa re wisa got, „Tu mûcîzeke çawa çêbîki bona ku em bîbinîn û îman bî te binên?“ **31** „Kalîkên me lî çolê de man xwarîn. Mîna ku hatiye nîvisîn, bona xwarîna wan, jorde (yanê ez-man de) Xudê nan da wan.“

**32** Îsa ji wan re wisa got, „Jî We re bî rasti

bî rasti dibêjim, ji jorde Mûsa (peyxamber) nan neda we, lî jorde nanê heqîqet, Bavê mîr dîde we. **33** Çîmkî nanê Xudê, yê ku jorde hatiye jêr û heyatê (yanê jîyanê) dîde dinê Ev e.“

**34** Xelkê ji wi re got, „Efendî, vî nani her-dem bîde me!“

**35** Îsa got, „Nanê jîyanê Ez îm. Yê ku were cem mîr qet bîrçî nabe, yê ku îmanê bî mîr bine qet tî nabe.“ **36** Ema mîr ji we re got ku, we ez ditîm, hun dîsa ji îman nakîn. **37** Yê ku Bav dane mîr, ew hemû wê werîn cem mîr û yê ku werîn cem mîr ez wan qet der nakîm. **38** Çîmkî ez ne lî dax-waza xwe digerin, lê ji bona ku xwestîna yê ku ez şandîme binîm şunê ji jorde hatîm jêr. **39** Xwestîna Yê ku ez şandîme ev e: yê ku wî dane mîr qet kesî wînda nekîm, Feqet roja paşiyê de wan hemûyan ji nûve rakîm. **40** Çîmkî xwestîna Bavê mîr ev e ku, hemû kesê ku Law ditîne û îman bî Wî kîrîne bîgîhên jîyana abedin. Ez ji wan roja dawiyê de ji nûve rabîkîm.

**41** Bona ku Îsa got, „Nanê ku jorde hatiye jêr Ez îm.“ Yahûdîyan dijê wî, (yanê hem-

ber İsa) gotegot kırım. **42** Wan got, „ma ev Lawê Ūsiv İsa nine?“ Em dayêka wi û Bavê wi ji nas dîkîn. Niha çawa dibe ku, ew dibêje ku ez ji jor hatime jêr?“

**43** İsa got, „nav xwe de gotegot nekîn.“

**44** „Eger Bavê ku ez şandîme, kesekê nekîşîne cem mîn, ew kes nikare were cem mîn. Yê ku were cem mîn ji ez wi roja dawiyê de ji nûve rabîkîm. **45** Mina ku peyxamberan ji nivisandîne, Xudê wan hemûyan re rê ya Xwe bide hu kırım! Herkesê ku dengê Bav dibîhizîn û ji wi hu dîkîn ew werin cem mîn. **46** Mana vê ne ew e ku kesekî Bav ditiye. Tenê yê ku ji Xudê ye Wi Bav, (yanê Xudê) ditiye. **47** Ji we re bî rasti bî rasti dibêjim ku, ki iman bî wi bine jiyana wi ya abedin heye. **48** Nanê jiyane Ez im. **49** Kalîkên we çolê de man xwarîn, lê disa ji mîrîn. **50** Nanê ku jorde hatiye xwar heye, yê ku wi nani bixwîn namîrîn. **51** Nanê ku jorde hatiye xwar, nanê sax (can) Ez im. Eger kesek ji vi nani bixwe, abediyen dijîn. Nanê ku ez bo oxira heyata dîndîm ji, Bedena mîn e.“

**52** Ser vê yekê Yahûdiyan got, „ev mirov

bo xwarîna me çawa dikare ku bedena xwe bide me?“ wisa bî hevûdu re koşîn kırım.

**53** İsa ji wan re wisa got: „We re bî rasti bî rasti dibêjim, heta ku hun bedena Lawê insan, (yanê bedena mîn) nexwîn û xwina mîn ji venexwîn, we de jiyana nabe. **54** Kesê ku bedena mîn dixwe û xwina mîn vedixwe heyata wan ya abedin heye û Ezê wan roja dawiyê de nûve rakîm. **55** Çimki bedena mîn xwarîna heqîqî û xwina mîn ji vexwarîna heqîqî ye. **56** Yê ku bedena mîn bixwe û xwina mîn vexwe bî mîn re disekîne û ez ji bî wi re. **57** Bavê ku diji mina ku ez şandîm û ez bî Wi dijim, wisa yê ku bedena mîn bixwe ji wê bî mîn bijî. **58** Ew nanê ku jorde hatiye xwar ev e; (yanê Ez im). Ne mina ku kalîkên we xwariye û ew mîrîn. Yê ku vi nani bixwe abed û abed diji.“ **59** Çaxê li Kefernahumê de ders dîda, di ibadetxanê ev tiştên ha gotin.

### **Pir kes İsa terk dîke**

**60** Dema ku gelek şagirtên İsa ev gotinên

Wi bihistin, gotin ku, „ev gotina ha girane, ma ki dikare ku guhdari bike?“

**61** Dema İsa fehm kır ku şagirt bo vêna gotegot dıkin, got, „Ma ev we dide şaş kırin?“ **62** „Eger ku lawê insan bılindê meqamê xwe, şûna ku Ew berê lı wê bû û hun ji vîna bîbinin...? **63** Yê ku jıyanê dıde Rih'e. feyda bedenê tune. Ew sozên ku mın ji we re gotın, ew Rih û jıyan ın. **64** Disa ji lı nav we de yên ku iman nakın hene.“ İsa yên ku iman nedıkırın û yê ku wê ew bıda dest destpêkê de nas dıkır û zani ku ew ki ye. **65** İsa wan re got, „Sebeba gotına ku mın ji we re got, dema ku 'Bav keseki nekişine cem mın kesek nıkare were cem mın, ev e.“

**66** Ser vê yekê gelek ji şagirtên İsa şûva vezerin û êdi lı tev İsa nedıgerıyan. **67** Wê çaxê, İsa ji dıwazdehan pırs kır û got, „Ma hun ji dıxwazın herın?“

**68** Simon Petrûs ji İsa re wisa got: „Ya Xudan, ma em herine ba ki? Gotınên jıyana abedin bı te re ne. **69** Em iman dıkın û zanın ku tu bimbarekê Xudê yi.“

**70** İsa ji wan re wisa got: „Yê ku hun dıwaz-

deh helbijartın, ma ne Ez ım? Disa ji lı nav we de yek iblis e.“ **71** İsa ev bona lawê Simon Yahudayê İsqaryoti got. Çımki Yahuda yek ji dıwazdeh şagirtên İsa bû û yê ku İsa bıdaba dest ew bû.“ (Yanê wi İsa êxbar kır).

## İsa tere Qudsa (Şerif)

**7** Pışti vê yekê İsa lı Celilê de dıgerıya. Bona ku Yahûdıyan xwastın ku wi bıkujın, wi nexweste ku bajarê Yayûdıyê de bıgere. **2** Cejna Yahûdıyan ya çardax çêkırınê nêzik bû. **3** Bı vi awayi bırayên İsa ji wi re gotın, „Jı vê derê derkeve û here bajarê Yahûdıyê“ ku, „şagirtên te ji tıştên ku tu çêdıki bıbinın. **4** Çımki ew kesê ku dıxwaze xwe bı eşkereyi bıde nas kırınê, tıştê ku çêdıke venaşêre. Madem ku tu van tıştan çêdıki, xwe şani, (nişanê) dınê bıde!“ **5** Heta bırayên Wi ji iman bı Wi nedıkırın.

**6** İsa ji wan re got, „Wextê mın hê nehatiye,“ feqet „bo we wext her dem munasıb e. **7** Dınê nıkare ji we nefret bıke, feqet ji mın nefret dıke. Çımki ez derbarê dınê de şehadetiyê dıkım ku karên wê xırabın.

8 Hun herin vê cejnê. Ez nîha naçim. Çımki wexta mın hê tamam nebûye.“

9 Pişti ji wan re ev tiştên ha got, bajarê Celilê de ma. 10 Feqet dema ku birayên Wi çûn cejnê, ew bî xwe ji çû. Ema Ew ne bî eşkereyi, lê bî dizi çû. 11 Yahûdi ji wê sirê de li Wi geriyan, pîrs kîrîn û gotin, „Ew li kû derêye?“

12 Nav qerebalixê de derbarê Îsa de pîr tişt dîhat qisekirin. „Pîr kesan dîgot, Ew mirovek rind e, hînên din ji dîgot na Ew xelkê dixapine û ji rê derdixîne.“

13 Disa ji ji ber ku xelk ji Yahûdi'yan dîtîsin, kesi nedikariya ku derbarê Îsa de eşkere tiştêkê bibêje.

14 Nivê idê derbaz bû. Îsa ji çu İbadetxanê, dest pê kir û ders da xelkê. 15 Yahûdi şaş man. Wan dîgot ku, „Vi mirovi qet nexwendîye, ma Ew çawa dikare ku wisa ilimdar bibe?“

16 Îsa ji wan re wisa got: „Dersa ku ez dîdim we ew ya mın nine, ew ders ya wi ye yê ku ez şandîme.“ 17 „Eger kesek dixwaze xwestina Xudê bine şunê, ew zane ku ev ilm, ilmê Xudê ye û ne yê mın e. 18 Yên ku

behsa xwe dikin xwazin xwe bilind bikin, feqet yê ku dixwaze Xudê bilind û bimbarek bike ew raste û li Wi de qet neheqî tune. 19 Ma Mûsa (peyxamber) qanûn, (yanê şeriat) neda we? Disa ji qet kesek li nav we de emirê şeriatê neanin şunê. Çima hun dixwazin ku mın bikujin?“

20 Wê çaxê tamamê qerebalixê ji Îsa re got: „Tu cîndar bûyî!“ „Ki dixwaze ku te bîkujê?“

21 Îsa ji wan re wisa got: „Mın xebatek çêkir hun hemû şaş dibin.“ 22 „Bona ku Mûsa bo sunet bûnê ferman, (emir) da we-eslînde ew emir ne ji Mûsa ye, ew ji kalikên we maye-roja Septê hun mirovekê sunet dikin. 23 Bona ku şeriatê Mûsa xirab nebe, mirovek roja Septê tê sunet kirin û, bona ku mın di roja Septê de mirovek tamamen sax kir, ma çima hun ji mın re bî hêrs dîkevin? 24 Mina dîtina çavan hukum nekin, bî rasti hukum bikin.“

## Ma Îsa, Mesih e?

25 Hinek ji xelkê Qudsa şerif ji bo vê yekê

gotin: „Ma yê ku li kuştina wi digeriyan, ne ev e?“ **26** „Mêze, Ew niha eşkereyi qise dike û qet kesek ji wi re tiştê nabêje. Ecêba serdaran bî rasti fehm kirine ku ew Mesih e? **27** Feqet em dizanin ku ev mirov ji kû derêye. Lê belê dema Mesih were, kes nîzane ku ew ji kûderê hatiye.“

**28** Wê demê Îsa ibadetxanê de ders dîda û Wi dengê xwe bilind kir û wisa got: „Hun hem min nas dikin û hem ji zanin ku Ez ji kûderê me! Ez bî xwe nehatim. Yê ku Ez şandime rast e, (heqiqet e). Hun Wi nas nakin. **29** Ez Wi nas dikim. Çimki Ez bî Wi re me û Wi ez şandim e.“

**30** Ser vê yekê Yahûdiyan xwestin ku Îsa bigirin, feqet qet keseki destê xwe nedan ser wi. Çimki saeta Wi hê nehatibû. **31** Ji xelkê ji pîr kesan iman bî Wi anin. Wan digot: „Dema ku Mesih were, ma ji vi Îsa zêdetir û mezintir mûcizan dikare ku çêbîke?“

**32** Fêrisiyan ji bihistin ku xelk derbarê, Îsa de van tiştan qise dikin. Serokê Kahinan û Fêrisiyan ji bo girtina Îsa mirov şandin.

**33** Îsa wisa got: „Ez hê midetek kurt bî we re me,“ „dû re disa diçim cem yê ku Ez

şandim e. **34** Hunê li min bigerin, feqet hun min nabinin. Û şunda ku Ez hazırım hun nikarin werin wê derê.“

**35** Li ser vê yekê Yahûdiyan hevûdu re gotin: „Gelo ev mirov wê kû ve here ku em nikarin Wi doz bikin?“ „Ma Ewê here nav Yûnaniyan, cem yên ku li nav wan de bela bûne, dersê dide wan? **36** Ew dibêje ku, hunê li min bigerin, feqet hun min nabinin û şuna ku Ez hazırım hun nikarin werin wê derê. Ma Ew dixwaze çî bibêje?“

**37** Roja idê ya dawiyê de û en roja mihim de, Îsa rabû ser piyan dengê xwe bilind kir û wisa got: „Eger ku kesek ti bûye bila were ba min û avê vexwe. **38** Mina ku nivîsên bimbarek ji dibêjin, yên ku imanê bî min binin li hundurê wan de robarê avê yê jindar diherike.“

**39** Lê belê Îsa ev derbarê wi Rih'i de got yên ku imanê bî Wi binin, bigirin. Ji ber ku Rih hê nehatibû dayin. Çimki Îsa hê bilind nebû. **40** Dema ku ji xelkê hîn kesan ev gotinên ha bihistin, hinekan got, „bî rasti Ev Ew Peyxamber e.“

**41** Hîn kesan ji got, „Ev Mesih e.“

Hin kesan ji got, „çî! Ma Mesih wê ji Celilê bê?“ **42** Ma kitêbê negotiye Mesih wê ji zuriyeta Davud (peyxamber) û gundê Davud Betlêhmê de were?“

**43** Wisa nav xelkê de ji sebebê Îsa firqat çêbû. **44** Hin kesan xwestin Îsa bigirin, feqet kesi destê xwe nedan Wi.

### **Îmansıztiya serokên xelkê Yahûdi**

**45** Dema ew kesên ku Fêrisiyan û serokên Yahûdiyan bona girtina Îsa şandibûn, ew şuve vegeriyan, serokan û Fêrisiyan ji wan pîrs kîrîn û gotin: „We çîma Ew neani?“

**46** Wan ji wisa got: „Qet tu caran kesekê mina ku Îsa qise dîke, qise nekiriye.“

**47** Fêrisiyan wan re gotin: „Ma hun ji hatin xapandin? Serok, êxtiyar û Fêrisi, ma qet kesekê iman bî Îsa ani ye? Lê belê ev xelkên ku Şeriatê nîzanin ew lanetline.“

**50-51** Lî nav wan de mirovek, yê ku navê wi Nikodim bû û berê bî şev hatibû ba Îsa, wi ji wan re wisa got: „Ma lî gora Şerîeta me heta mirovekê guhdari neke û tiştê ku ew dîke ji hu nebe, derbarê wi de hukum

bide, rast e?“ **52** Ji wi re gotin, „ma tu ji ji bajarê Celilê yi?“ „Lê bigere û mêzeke, ji bajarê Celilê peyxamber dernakeve.“ **53** Piştî herkes çû mala xwe.

### **Jinîk, yanê, pireka ku zina kiriye**

**8** Îsa çû çiyayê zeytûnê. **2** Roja dîn, (yanê dortira sibê) zû disa vegeriya ibadet-xanê. Temamê xelkê hatin cem wi. Ew ji rûnişt dest pê kir û ders da wan. **3-4** Mirovên dindar û yên Fêrisi, jinîkek dema ku zina dikir girtibûn û wan ew jinîk anin cem Îsa. Wan jinîk derxist meydanê û Îsa re gotin „Mamoste vê jinîkê dema ku zina dikir hat girtin.“ **5** „Mûsa (peyxamber) şeriatê de emir daye me ku yên wisa werin kevir kîrînê, tu bi tê çî bêji?“ **6** Wan bo cerêbandinê eva ha gotin da Îsa suçdar derxîn. Lê belê Îsa xar bû, bî tiliya xwe, lî ser erdê nivisandin dînisandin. **7** Ji ber ku wan di pîrs kîrînê de berdewam kîrîn, lî ser vê yekê Wi xwe rast kir û ji wan re got: „Ji we yê bê suç ki ye bila ew kevirê pêşi bavêje ser wê jinîk ê!“

8 İsa disa xar bû û dest bı nıvisinê kır.  
9 Dema ku wan ev bihistin, dest pê kırım ji yên êxtiyar û heta yê paşiyê yek bı yek bazdan çûn û İsa tenê cih hiştin. Jinik ji wê meydanê de sekini bû. 10 İsa xwe rast kır û jınikê re got: „Jınikê kanên ew? Ma qet kesekê tu hukum nekiri?“

11 Jinkê got: „Na ya Xudan, tu kesi ez hukum nekirim.“

İsa got: „Ez ji te hukum nakim.“ „Here û êdi ji vir şûnde guneh neke!“

### **Şehadetiya ku derbaz dibe, yanê tê qebûl kırım ê**

12 İsa disa dengê Xwe bılind kır û ji xelkê re got: „Ez ronahiya dînê me. Kesê ku li dû min werin, ew li tariyê de nameşin û dibin xwediyê ronahiya jiyane.“

13 Fêrisiyan got: „Tu ji bo xwe şahadetiye diki, şehadetiya te rast nîne.“

14 İsa ji wan re got: „Eger ku ez bo xwe şehadetiye bikim ji, disa şehadetiya min rast e. Çimki ez zanim ku, ez ji kû hatim û dîçim kû derê. Feqet hun nızanin ku ez ji

kû hatim û bı kû ve dîçim. 15 Hun li gora bedenê hukum dîkin. Ez hukum li kesi nakim. 16 Feqet Ez hukum bikim ji, hukmê min rast e. Çimki Ez ne tenê me, ez û Bavê ku ez şandime bı hev re ne. 17 Şeriat we ji dibêje ku şehadetiya du kesan rast e. 18 Yê ku bo min şehadetiye dike ez im. Û Bavê ku ez şandime, Ew ji ji bo min şehadetiye dike.

19 Wê çaxê wan ji İsa pirs kır û got: „Bavê te li kû ye?“ İsa ji wan re got: „Hun ne min nas dîkin û ne ji Bavê min. Eger we ez nas bikirima, we wê Bavê min ji nas bikirana.“ 20 İsa çaxê ev gotinên ha gotin ibadetxanê de dema ku ders da, şunda ku pere top dîkırin li wê derê de got. Kesi ew negirt. Çimki saeta wi hê nehatibû.

21 İsa ji wan re disa got: „Ez terim. Hunê li min bigerin û li nav gunehên xwe de bimirin. Şuna ku Ez terim hun nıkarın werin wê derê.“

22 Yahûdiyan got: „Ecêba ew wê xwe bıkujê?“ „Çimki ew dibêje ku şuna ku ez terim hun nıkarın werin wê derê.“

23 İsa ji wan re got: „Hun ji jêrin, ez ji

jorim.“ „Hun ji vê dinê ne, ez ne ji vê dinê me. **24** Va ye ji bo vê yekê min ji we re got, „Hunê li nav gunehên xwe de bimirin.“ Eger hun iman nekîn ku, ez Ew im, hunê li nav gunehên xwe de bimirin.“

**25** Wan ji Îsa pîrs kir û gotin, „Tu ki yi?“

Îsa, „Ez tam Ew zatim yê ku min di dest-pêkê de ji we re got.“ **26** „Li derbarê we de hê pîr gotin û pîr tiştê min yên ku hukum li we bikin hene. Lê belê Yê ku ez şandime heqîqet e. Ez ji Wi çî bîbîhizim ji dinê re wê dibêjim.“

**27** Wan fehm nekîr ku Îsa ji wan re derbarê Bav de çise kir. **28** Ji bo vê yekê Îsa wisa got: „Dema ku we Lawê insan, bilindê jor kir, wê çaxê hunê fehm bikin ku ez Ew im û ez bi xwe qet tiştê nakim, feqet Bav çawa min re bêje, ez ji wisa dibêjim. **29** Yê ku ez şandime li tev min e, Wi ez tenê nehîştim. Çimki ez her dem tiştê ku Wi, (yanê Xudê) xoşnûd dikin, çêdikim.“ **30** Dema ku Wi wisa çise kir, pîr kesên iman bi Wi ani.

## Zarokên Îbrahim xelil û zarokên İblis

**31-32** Îsa wan Yahûdiyên ku iman bi wi kirin bûn, ji wan re got: „Eger ku hun gotinên min de bisekinin, wê çaxê hun bi rasti şagirtê min in. Hunê rastiye bîzanin û rasti ji wê we azad bike.“

**33** Yahûdîyan ji Îsa re wisa got: „Em zuryeta İbrahim xelil in“. Me, „tu caran ji kesire koletî nekiriye“. Tu çawa ji me re dibêji ku: „Hunê werin azad kirin?“

**34** Îsa ji wan re got: „Ez ji we re bi rasti bi rasti dibêjim, hemû kesê ku guneh dikin ew koleyê gunehin.“ **35** „Kole li malde abedin namine, feqet Law herdem dimine. **36** Bo vê yekê, eger ku Law we azad bike, hun bi rasti azad in. **37** Ez dizanim ku hun zuryeta İbrahim xelil in. Lê belê hun dixwazin ku min bikujin. Çimki hun di dilê xwe de cih nadin gotinên min. **38** Ez ji tiştê ku ba Bavê xwe dibînim dibêjim, hun ji tiştê ku ji Bavê xwe bîhizin dikin.“

**39** Wan ji Îsa re wisa got: „Bavê me İbrahim xelil e.“

Îsa ji wan re wisa got: „Eger ku hun zaro-



kên İbrahim xelil bûna, we wê karên İbrahim xelil bıkırana.“ **40** „Feqet hun nıha dıxwazın ku mın, yê ku ji Xudê rasti bıhistiye û ji we re gotiye, bıkujın. İbrahim xelil ev tıştên ha nekır. **41** Hun karên bavê we dıkın.“ Wan ji İsa re got: „Em ji zinayê newelıdın. Tek Bavekê me heye, Ew ji Xudê ye.“ **42** İsa ji wan re got: „Eger ku Xudê Bavê we bûya, we ji Ez hez bıkırama.“ Çımki ez ji Xudê derketım û hatım. Ez bı xwe nehatım, Xudê ez şandım. **43** Çıma hun va gotınê ku ez ji we re dibêjim, fehm nakın? Jı ber ku Hun gotınên mın guhdari nakın. **44** Hun ji Bavê xwe iblisın û hun dıxwazın ku xwestına bavê xwe bıkın. Ew destpêkê de qetil bû. Ew lı rastiye de nesekın. Çımki lı wi de rasti tune. Dema ku ew derew dıke, ji ya xwe dibêje. Çımki ew derewçıye û bavê derewan e. **45** Feqet bona ku ez rasti yê dibêjim, hun iman bı mın nakın. **46** Lı nav we de ki dıkare hebûna guneh dı mın de bıde ispat kırın? Eger ku ez ji we re rastiye dibêjim, hun çıma iman bı mın nakın? **47** Yê ku ji Xudê ne, ew guh dıdın gotınên Xudê. Jı bo wê

yekê hun guh nadinê, çımkı hun ne ji Xudê ne.

## Mezıntrıya İsa

**48** Yahûdıyan ji İsa re wısa got: „Me ji te re got, tu ji Semiriyê yi û dı te de cın heye, ma gotına me ne rast e?“ **49** İsa got: „Mın de cın tune; lê belê ez Bavê Xwe re hurmetê dıkım û hun ji mın nızım dıkın. **50** Feqet ez lı izeta xwe nagerım; yeki ku dıgere û hukım dıke heye. **51** Jı we re bı rasti bı rasti dibêjim, eger insanek gotına mın bıgire ew abedin mırınê nabine.“

**52** Yahûdıyan ji İsa re got: „Me nıha fehm kır ku, dı te de cın heye.“ İbrahim xelil mır, peyxamber ji mırın. Ú tu dibêji: „Eger kesek gotına mın bıgire, abedin mırınê tam nake. **53** Yan tu ji bavê me İbrahim xelil mastır i? Ew mır, peyxamber ji mırın; ma tu xwe ki zen diki?“

**54** İsa wısa got: „Eger ku ez xwe bılınd bıkıım, izeta mın ne tışteke. Yê ku mın bılınd dıke Bavê mın e; hun dibêjin ku: ‚Ew Xudê yê‘ me ye **55** û hun Wı nas nakın.

Feqet ez Wi nas dıkım; û eger ez bêjim ku ez Wi nas nakım, wê çaxê ez ji mina we dıbım derewin; feqet ez Wi nas dıkım û gotına wi qebûl dıkım. **56** Bavê we İbrahim xelil bona ku ew roja mın bıbine bı şabû-niyê coşin kır. Wi dit û dılgeş bû.“

**57** Bo vê yekê Yahûdiyan ji İsa re got: „Tu hê pênce sali nini. Ma te İbrahim xelil ji dit?“

**58** İsa wan re got: „Ez ji we re bı rasti bı rasti dıbêjim, jiberi ku İbrahim xelil hebe ez heme.“

**59** Wê çaxê bona ku İsa kevir bıkin wan ji erdê kevir girtın, feqet İsa xwe veşart û ibadetxanê der ket.

### İsa çavê mirovekê kor vedıke

**9** Dema ku İsa derbaz dıbû, mirovekê ku ji dayika xwe kor hatıbû dinê dit.

**2** Şagirtên İsa ji wi pırs kırın û gotın: „Xudan, ji bo ku ev kor welıdiye ki guneh kırıye, vi an dayik û bavê wi guneh kırın e?“

**3** İsa ji wan re wisa got: „Ne wi, ne ji dayik û bavê wi guneh kırın. Encax bona ku

karên Xudê lı ser wi xuya bıkin ew çêbûye. **4** Karên Yê ku ez şandime, hê roj gereke em bıkin; şev tê, wê çaxê tu kes nıkare kar bıke. **5** Heta ku ez dinê de me, ez ronahiya dinê me.“

**6** Pışti van tıştan tûyê erdê kır, pê xaziya xwe çamûr çêkır û ew çamûr lı çavê wi da.

**7** İsa ji wi re got: „Here, hewza Şiloam de xwe bışu.“ Tercuma Şiloamê hatiye şandin e.

Ew mirov ji çû xwe şuşt û çavê wi vebû û wisa şunde hat. **8** Wê demê cinarê wi û ew kesên ku dızanin ew berê parsek bû, wisa gotın: „Ev mirov yê ku rûdınışt û pars dıkır, ma ev ne ew e?“

**9** Hınan got: „Erê ew e“ û hınên dın ji got: „Na, ew nine lê mina wi ye.“

Wi bı xwe got: „Ez ew ım.“

**10** Wê çaxê wan jê pırs kır û gotın: „Ma çavê te çawa vebûn?“ **11** Wi ji ji wan re wisa got: „Ew mirovê ku navê wi İsa ye, wi çamûr çêkır û çavê mın re da û got: „here hewza Şiloamê de xwe bışu. Ez ji çûm lı wê mın xwe şuşt û çavê mın vebûn.“ **12** Wan ji wi pırs kırın: „Ew lı kû ye?“ Wi ji got, „nızanım.“

## Pırsiyari kırına Fêrisiyan

**13** Ew mirovê ku berê kor bû, bîrın cem Fêrisiyan. **14** Roja ku İsa çamûr çêkırîbû û çavê wi re dabû, ew roj roja sebtê bû.

**15** Bo vê yekê Fêrisiyan disa ji wi mirovi pırs kırın û gotın, çavê te çawa vebûn? Wi ji got: „İsa çamûr çavê mın re da, mın xwe şuşt û dit.“

**16** Ji ber vê yekê ji Fêrisiyan hın kesan wisa got: „Ev mirov ne ji xudê ye.“ „Çımki ew şertê roja sebtê naine şunê.“

Feqet hınên dın ji got: „Miroveki gunehkar çawa dikare ku mûcize yê mina vê mûcizê çêbike?“

Wisa navbera wan de firqat çêbû. **17** Wan disa ji wi mirovê ku berê kor bû pırs kır: „Tu ji bo wi mirovê ku çavê te ve kır, çı dibêji?“

Wi mirovi got: „Ew peyxamber e.“

**18** Yahûdi, heta ku gazi dayik û Bavê wi mirovê ku berê kor bû nekırın, bawer nekırın ku ew berê kor bû û nıha çavên wi vebûn e. **19** Wan ji dayêk û bavê wi pırs kır û gotın: „Lawê we yê ku hun dibêjin kor

hate dinê ev e? Başê, ma nıha ew çawa dibine?“

**20** Dayêk û bavê wi mirovi ji wan re wisa gotın: „Em zanin ku ev lawê me ye û em vına ji dizanin ku ew dema ku ji dayêka xwe bû kor bû. **21** Feqet em nızanin ku ew nıha çawa dibine, ki çavê wi vekırine em nızanin, jê pırs bıkın. Ew mezin e, ji bo xwe bıla ew qıse bıke.“ **22** Ew ji Yahûdiyan tırsin, bo wê yekê wan wisa qıse kır. Çımki Yahûdiyan dı nav xwe de qerar gırtıbûn ku, ki eşkereyi bıbêje ew Mesih e, ew wan ji ibadetxanê bıkın der. **23** Bo wê yekê dayêk û bavê wi mirovi gotın: „Ew mezin e, ji wi pırs bıkın.“

**24** Wan disa bang wi mirovê ku berê kor bû kır û ji wi re gotın: „Jı Xudê re şıkır bıke!“ „Em zanin ku ev mirove gunehkar e.“

**25** Wi mirovi ji ji wan re wisa got: „Ew gunehkar e yan gunehkar nine, ez nızanim. Feqet tıştê ku ez zanim ev e, ez korbûm û nıha ji dibınım.“

**26** Wê çaxê ji wi re gotın: „Wi ji te re çı kır? Wi çavê te çawa vekır?“

**27** Wi ji wan re got: „Mın nıha ji we re got,

feqet we guhdari nekır.“ „Çıma hun dıxwazın dısa bıbıhızın? Yan hun ji dıxwazın bıbın şagırtên Wi?“

**28** Wan ji wi mirovi re kıfr kır û gotın: „Tu şagırtê Wi yi!“ Wan got: „Em şagırtê Mûsa ne. **29** Em zanin ku Xudê ji Mûsa re gotiye. Feqet em nızanin ku ev mirov ji kû ve hatiye.“

**30** Mırov ji wan re wısa got: „Ev e tıştı ku insan dıde şaş kırıne! Hun nızanin ew ji kû ve hatiye, ema çavên mın Wi vekır. **31** Em zanin ku Xudê guh nade kesên gunehkar. Eger ku kesek ji Xudê re ibadet dıke, û irada Wi bıke, Xudê guh dıde wi. **32** Tarıxa dınê de hê kesı nebıhistiye ku, kesı çavê miroveke ku kor hatiye dınê vekiriye. **33** Eger ku ev mirov yê Xudê nebûya, wi nedıkari ku tıstekê, (mûcize kê) wısa çêbıke.“

**34** Ji wi re gotın: „Tu temamlı nav guneh de welıdı, ma tu dersê dıdı me?“ Wısa wan ew avêtın der.

### **Kor bûna rıhani**

**35** İsa bıhist ku wan ew mirov avêtın der.

İsa ew mirov dit jê pırs kır û got: „Tu iman bı Lawê İnsan diki?“

**36** Wi mirovi wısa got: „Efendi, Ew ki ye ku, ez bı Wi iman bıkim?“ **37** İsa ji wi re got: „Hem te Ew dit û hem ji yê ku niha lı tev te qıse dıke Ew e.“ **38** Wi mirovi got: „Ey Xudan, ez iman dıkım! û wi ji İsa re secde kır.“ **39** İsa ji got: „Ez hatım ku, yê ku korın bıbinın û yê ku ne korın ji kor bıbin; ez bo hukum kırıne hatım dınê.“

**40** Hın kesên Fêrisi ji cem İsa bûn, wan dema ku ev gotınên İsa bıhistın, ji İsa pırs kırıın: „Ma em ji korın?“ **41** İsa ji wan re wısa got: „Eger ku hun kor bûna gunehê we wê nebûya,“ „feqet niha: „Hun dibêjin ku, ‚em dıbinın‘ bo vê yekê gunehên we dısekıın.“

### **Şıvanê rınd, (yê qenc)**

**10** „Bı rasti bı rasti ji we re dibêjim, yê ku deri re naçe hewşa miyan û rê ki dın re ketiyê dız û eşqıya ye. **2** Feqet yê ku deri re tere hindur ji, ew şıvanê miyan e. **3** Dergevan wi re deri vedıke, mi dengê

şivan dibîhizin; şivan ji mi yê xwe bî navê wan bang dîke û wan dibe der. **4** Dema ku wi mi yê xwe hemû derxistin der, ew lî pêşiya wan tere û mi ji lî dû wi terin. Çimki mih dengê wi nas dîkin. **5** Û lî dû yê xerib naçin û ji ber wan direvin. Çimki dengê xeriban nas nakin.“

**6** Îsa ji wan re ev temsile got, feqet wan disa ji xwestina Îsa fehm nekir.

**7** Ser vê yekê Îsa ji wan re disa got: „We re bî rasti bî rasti dibêjim“, „ez deriyê miyanim. **8** Yê ku berê min hatin hemû diz û haydut bûn, feqet miyan guh nedan wan.

**9** Ez deri me. Eger ku kesek di min re here hindur, xilas dibe. Tere hindur, diçe der û çêregeh dibine. **10** Diz tenê bo diziyê, kuştinê û bo tune kirinê tê. Ez hatim ku insan bîbin xwediyê jiyane, jiyana wan ya zêde hebe. **11** Ez şivanê rindim. Şivanê rind oxira miyê xwe de canê xwe dide. **12** Ew mirovê ku şivan û xwediyê miyan nine yê ucretli, dema ku ew hatina gur bîbine, miyan ber dide û direve, tere. Gur ji wan digre û belav dîke. **13** Ew mirov direve, çimki ew ucretliye û bona miyan xem nake. **14-15** Ez

şivanê rind im. Ez yê xwe nas dîkim. Çawa Bav min nas dîke û ez ji Bav nas dîkim, yê min ji wisa min nas dîkin. Ez bo miyê xwe canê xwe dîdim. **16** Hê miyê minê din ji hene ew daxilê vê hewşê nin in. Ez gerek wan ji binim. Ew dengê min bîbîhizin û bîbin tek şivan û tek naxir. **17** Bona ku ez canê xwe dîdim ku ez disa şuve bigirim. Bona vê yekê Bav ji min hez dîke. **18** Kes nikare canê min ji min bigire; feqet ez wi bî xwe û xwe dîdim. Bo dayina canê min û şuve girtina wi qudreta min heye. Min ev ferman ji Bavê xwe girt.“

**19** Ji ber vê qise kirina Îsa lî nav Yahûdiyan de disa firqat çêbû. **20** Lî nav wan de pir kesi got: „Wi de cîn heye, ew din e; ma hun çima wi guhdari dîkin?“

**21** Hinên din ji got: „Ev qisetên ha yê mirovên cîdar ninin.“ „Cîn dikare ku çavê koran vebike?“

## **Bêimantiya Yahûdiyan**

**22** Wê sirê de lî Qudsa şerif de bo biranina vebûna ibadetxanê id hebû. Mevsim ji

zivistan bû. **23** Îsa hindur ibadexanê, li cem eyvana sileyman de digeriya. **24** Yahûdiyan dora wi girtin û ji wi re wisa gotin: „Ma Tu heta kengê me li şikê de bihêlini?“  
„Eger ku Mesih tu yi, ji me re bi eşkereyi bibêje.“

**25** Îsa ji wan re wisa got: „Mîn ji we re got, feqet we iman nekîr. Ew xebatê ku mîn bi navê Bavê xwe kîrin, ew ji bo mîn şehadetiye dikin. **26** Feqet hun iman nakin. Çimki hun ji daxilê miyên mîn ninin. **27** Miyên mîn dengê mîn dibihîzin. Ez ji wan nas dikim û ew ji li dû mîn tîn. **28** Ez heyata, (jiyana) abedin didime wan û ew qet mehf nabîn. Qet kesek nikare ku wan ji destê mîn derxine. **29** Bavê mîn Yê ku ew dane mîn ji hemûyan mezintir e. Quveta kesi nikare wan ji dest Bav derxine. **30** Ez û Bav yek in.“

**31** Yahûdiyan disa ji erdê kevir girtin û xwastin ku Îsa bîdîn kevir kîrin ê. **32** Îsa ji wan re wisa got: „Mîn gelek xebatê rind yên ji Bav nişan we dan.“ „Hun ji bo kîjan xebatê, mîn kevir dikin?“

**33** Yahûdiyan ji Îsa re wisa got: „Em te bo

xebatê rind nine, bona ku te kîfr kîr em te kevir dikin. Tu ji insani, feqet tu dibêji ku Ez Xudê me.“

**34** Îsa wisa got: „Ma şerîata we de nehatiye nivîsinê? Ku Mîn got, ‚hun ilahin?‘

**35** Xudê, Kelama Xwe ki re şandiye, ji wan re ilah tê gotin û kitêb xirab nabe. **36** Bav ez bimbarek kîrim û şandim dinê. Wê çaxê bona ku mîn got ez Lawê Xudê me, hun çawa mîn re dibêjin ku te kîfr kîr? **37** Eger ku mîn xebata Bavê xwe nekiriye, iman bî mîn nekîn. **38** Ema eger ku ez dikim û hun nexwazin iman bî mîn bîkin, balê imanê bî xebatê ku ez dikim binin. Wisa ku, hun bîzanin û fehm bîkin ku Bav bî mîn re ye û ez ji bî Bav re me.“

**39** Wan disa xweste ku Îsa bigirin, feqet ew ji dest wan derket û çû.

**40** Îsa disa çû aliyê çemê Erdenê, şunda ku Yehya (peyxamber) berê vaftiz kîr û li wê derê ma. **41** Pîr kes hatin cem Îsa û gotin: „Gerçî Yehya (peyxamber) qet mûcîze çênekîr; feqet ew tiştê ku Yehya ji bo Îsa got, ew hemû rast bûn.“ **42** Û li vê derê pîr kesi iman bî Îsa anin.

## Mırına Lazar

**11** Gundê Meryem û Xuşka wê Marta li Bêtanyê de mirovekê ku navê wi Lazar bû nexwaş bû. **2** Meryem, ew jinika ku rûnê bihn xweş li Xudan da bû û bi pora xwe ji lingê Wi paqij kir ew bû. Ew mirovê ku nexweş bû, Lazar ji bireyê Meryemê bû. **3** Her du xuşkan ji Îsa re xeber şandin û gotin: „Ya Xudan, yê ku tu jê hez dikî nexwaş e.“

**4** Dema ku Îsa ew xeber bihist wisa got: „Ev nexweşi bo mırinê nine, feqet ev ji bo bılind bûna Lawê Xudê û izeta Xudê ye.“

**5** Îsa, hez ji Marta, xuşka wê Meryem û Bireyê wan Lazar dikir. **6** Û dema ku Îsa bihist Lazar nexwaş e, li şunda xwe de hê du rojê dîn ma. **7** Dû re şagirtên xwe re got: „Em veşerî bajarê Yahûdiyê.“

**8** Şagirtan ji Wi re got: „Xudan“, „Yahûdîyan gawek pêşde xwestin ku te kevîr bikin. Ma tu disa diçi wê derê?“

**9** Îsa ji wan re got: „Ma rojek diwazdeh saet nine? Eger insan rojê bigere tilpeki

nabe. Çimki ronahiya vê dînê dibine. **10** Feqet insanê ku şev biger e, ew tilpeki dibîn. Çimki ronahi di wi de tune.“ **11** Îsa li dû vê qise kirinê re got: „Dostê me Lazar xew de çûye;“ „feqet ez terim ku wi hêşyar bikim.“ **12** Şagirtên Îsa gotin: Ya „Xudan“, „eger ew xew de çûye wê rind bibe.“ **13** Îsa ev ji bo mırina Lazar got, feqet şagirtên Wi fehm nekirin. Wan zen kir ku Wi bo xew de çûnê got. **14** Wê çaxê Îsa ji wan re bi eşkereyi got: „Lazar miriye“. **15** „Bona ku hun iman bikin, kêfa min tê ku ez ne li wê derê bûm. Em niha herin cem Lazar.“ **16** Şagirtê Îsa yê ku jêre digotin, „Zo“ navê wi Tomas bû, wi ji wan şagirtên dîn re got: „Em ji ji bo mırinê bi wi re herin!“

## Şina Marta û Meryemê

**17** Dema Îsa hat, xeber girt ku Lazar çar roj e ku kîrîne mezelê. **18** Bajarê Bêtanyê ji Qudsê nêzika panzdeh tir avêtinê dûr bû. **19** Pîr Yahûdi hatibûn cem Marta û Meryemê bo mırina birê wan dixwestin ku wan teseli bikin. **20** Dema ku Marta hatina Îsa

bihist derket der û berbi İsa ve çû, xuşka wê Meryem ji mal de rûdinişt.

**21** Marta ji İsa re wisa got: „Ya Xudan“ „eger tu li vira bûna, bireyê mın nedimır.

**22** Ez niha ji zanim ku, tu ji Xudê çı bıxwazi Ewê bıde Te.“

**23** İsa got: „Bireyê te radibe.“

**24** Marta got: „Ez zanim roja dawiyê de, (yanê roja mehşerê) bireyê mın radibe.“

**25** İsa ji wê re wisa got: „Qiyamet û Heyat Ez im.“ „Yê ku imanê bı mın bine, ew bımirre ji disa diji.

**26** Yê ku jin dike û iman bı mın dike qet namir e. Tu ji vira re iman diki?“

**27** Marta got: „Erê ya Xudan.“ „Mın iman ani ku Tu Lawê Xudê yê ku were dinê Mesih i.“ **28** Marta ev got û li dû re bı dizika çû gazi xuşka xwe Meryemê kir û got: „Mamoste li viraye û bang te dike.“

**29** Dema ku Meryemê ev bihist, hema rabû û çû cem İsa. **30** İsa hê negihijtîbû gund, Ew şunda ku Marta rasti Wi bû, hê li wê bû. **31** Ew cinarê ku tev Meryemê mal de man û Yahûdiyê ku bo taziye li wê bûn, dema ku wan dit Meryem bı lez derket der; wan got Meryem tere ser mezela birayê

xwe û li wê bıgiri, ew ji li dû Meryemê çûn.

**32** Meryem gıhişt şunda ku İsa sekini bû û wê İsa dit, xwe avite lingê Wi û got: „Ya Xudan“, eger „Tu li vir bûna, birayê mın nedimır.“

**33** Dema ku İsa dit, Meryem û ew Yahûdiyê ku li tev wê hatıbûn girin, dilê İsa jan da û Rihê wi ji xemgin bû. **34** İsa got: „We Lazar li kû hıldanin?“ Wan got: „Ya Xudan were û mêzeke!“

**35** İsa giriya. **36** Yahûdiyan got: „Mêze, İsa ew mırov çiqas hez dikır!“ **37** Feqet li nav wan de hın kesan got: „Vi zati çavê koran vekır, ma wi nedıkariya ku Lazar ji ji mırinê xilas bıke?“

### **İsa, Lazar ji mırinê rakır**

**38** İsa disa kûr naliya û gıhişt mezêlê. Mezel mıxarek bû, kevirek ji dêri de hebû.

**39** İsa got: „Kevır bılınd bıkın!“

Xuşka Lazar Marta, ji İsa re wisa got: „Ya Xudan, ev çar roje ku mıriye û bihn ketiye wi.“

**40** İsa got: „Mın ji te re negot eger ku tu iman bıki, tê izeta Xudê bıbini?“



41 Ser vê yekê wan kevir rakır. İsa çavê xwe rasti jor kır û wisa got: „Bavê mın, bona ku te ez bihistim te re şıkir dıkım.

42 Mın zani ku tu her dem mın dibihizi. Feqet mın ev bona van insanê lı vê derêne got ku, ew iman bıkın ku te ez şandım e.“

43 İsa lı dû vê qıse kırınê re dengê xwe bılınd kır û wisa got: „Lazar were der!“

44 Miri dest û lingê wi pê paçan girêdayi û rûyê wi pê dismalê gırti derket, (hat der). İsa ji wan re got: „Wi vekın û berdın bıla here.“

### **Plan kırına kuştına İsa**

45 Wê demê ew Yahûdiyên hatıbûn ba Meryemê û dema ku wan xebata ku İsa çêkır dit, pır kesi ji wan iman bı İsa ani.

46 Feqet lı nav wan de hınên dın çûn ba Fêrisiyan û lı derbarê tiştê ku İsa çêkır xeber dan wan. 47 Lı ser vê yekê serokê Kahinan û Fêrisiyan Meclisa bılınd top kırın û gotın: „Ma em çı bıkın? Ev mırov pır mûcize çêdıke. 48 Eger em Wi wisa bihêlın, herkes wê imanê bı Wi bine û Rom ji wê

werın hem şuna me û hem ji miletê me ji ortê ra kın.“

49 Lı nav wan de yeki, serokê Kahinan Qayfa got, „hun qet tiştê nızanin.“ 50 „Şunda ku welat hemû tune dibe, bıla tek mirovek oxıra gel de bımire, ji bo me pıtır rinde. Ma Hun vına fehm nakın?“

51-52 Wi ev bı xwe û xwe negot. Lê belê ji bo ku wê salê ew serokê Kahinan bû, derbarê İsa de peyxamberti kır û wisa got: İsa bo milet û ne ji bo milet tenê feqet bo hemû zarokên Xudê yên ku belav bûne, wan top û yek bıke, bo wê yekê gerek İsa bımire. 53 Wisa lı dû wê rojê re, plan kırın ku ew İsa çawa bıkujın.

54 Bo vê yekê êdi İsa lı nav Yahûdiyan de eşkereyi negeriya. Ew ji wê veqetiya û çû nêzikê çolê, bajarê Efraim. Ew tev şagirtên xwe lı wê derê ma. 55 Cejna Yahûdiyan ya derbazbûnê (yanê ya pasoxê) ji nêzik bû. Pır kes ji bona pakij bûnê, beri idê çûn Qudsa şerif. 56 Ew lı wê derê lı İsa geriyar. Dema ku ew hê ibadetxanê de bûn, hevûdu re wisa pırs kırın: „Hun çı dibêjın? Ecêba İsa nawere idê?“

57 Serokê Kahinan û Fêrisiyan bo girtina Îsa emir dan û gotin ku, ki şuna Wi zane lazime ku xeberê bide.

## Îsa tere gundê Bêtanyê

(Met.26:6-13; Mer.14:3-9)

**12** Îsa, şeş rojan berê cejna derbaz-bûnê hat gundê Lazar; yê ku Îsa ew ji mîrînê rakiribû. **2** Lî wê ji bo Îsa ziyafet çêkîrin. Marta xizmet kir. Yê ku lî tev Îsa lî sîfrê rûniştibûn yek ji wan Lazar bû. **3** Mer-yemê niv litir rûnê pîr qîmetli, ji rûnê sîmbîla Hindûstanê ani û lingê Îsa re da û bi pora xwe ji lingê Wi paqij kir. Ew mal bi bihna wi rûnê xweş yê rind tiji bû.

**4-5** Ema şagirtêk yê Îsa, yê ku Ew dû re bîdana dest (dijmîn) Yahûda Îsqaryot wisa got: „Çima ev rûn bi sêsed dinaran nehat firotinê û perên wi ji nedan feqîran?“ **6** Wi ev bona feqîran negot, bona ku ew bi xwe dîz bû got. Kisikê peran bi wi re bû û wi ji perên kisikê de bûn, dîdiziya.

**7** Îsa got: „Jinikê rehet berde.“ „Bîla vêna bo roja ku mîn dikin mezêlê hilîne. **8** Feqîr

tîm û tîm lî tev we ne, feqet ez tîm lî tev we ninim.“ **9** Komekê Yahûdiyan yeki mezin bihistin ku Îsa hatiye gundê Bêtanyê û tenê bo Îsa nine, bo ditina Lazar yê ku Îsa ji mîrînê rakiribû ew hatin cem Îsa. **10** Serokê Kahinan xwastin ku Lazar ji bîkujin. **11** Çimki bona Lazar pîr Yahûdi diçûn û iman bi Îsa dikirin.

## Îsa tere Qudsa Şerif

(Met.21:1-11; Mer.11:1-11; Lûq.19:28-40)

**12** Dortira rojê, komeke insan ya mezin yê ku hatibûn, û wan bihist ku Îsa ji were Qudsa şerif. **13** Wan guliyê xorme girt û berbî Îsa çûn. Kirin qirin û wisa bang kirin, „Hozana! yê ku bi navê Xudan hatiye, meth kirin ji Qiralê Îsrail re be!“

**14-15** Îsa, sipek dit û lê siwar bû. Çawa ku kitêba bîmbarek de hatiye nivîsin: „Netirse, qîza Sion! Mêze, Qiralê te siwar sipekê kerê bûye û tê.“

**16** Şagirtên Îsa berê ew tişt fehm nekirin. Ema wexta ku Îsa hat bîlind kirinê, wan ev anin bira xwe ku ew tişt ji bona Îsa hatine

nivisin û xelkê ji ev ji bo wi çêkırin. **17** Ew xelkê ku dema Îsa gazi Lazar kır û ew ji mırinê rakır lı wê ba Îsa bûn, wan ji bo wina şehadeti kırın. **18** Lı ser vê yekê xelk berbı Îsa çû. Çımki wan bihist ku wi ev mûciza çêkırıbû. **19** Fêrısıyan ji ji hevûdu re wısa dıgotın: „Hun dibının ji dest we qet tıştek nayê. Va ye tûm dınê lı dû Îsa ketiye û dıçe.“

### **Îsa ji bo mırına xwe ji pêšta xeber da**

**20** Roja idê lı nav yên ku bo ibadet kırinê hatibûn Qudsa şerif hın kesên Yûnan ji hebûn. **21** Vana hatın cem Filipûs, ew ji gundê Bajarê Celilê Bêtseydayê bûn, Wan ji Filipûs rıca kır û gotın: „Em dıxwazın ku Efendi Îsa bıbinın.“

**22** Filipûs ji çû xeber da Andriyas. Andriyas û Filipûs ji çûn xeber dan Îsa.

**23** Îsa wan re got: „Saeta ku Lawê insan were bılınd kırinê hat.“ **24** „We re bı rastı bı rastı dibêjim, heta ku teney genım nekeve lı nav erdê û nemıre, ew tenê dimıne. Feqet dema ku bı mire zehf mehsûl dıde.

**25** Yên ku canê xwe hezdıkın, ew wi zay dıkın. Feqet yên ku dı vê dınê de ji canê xwe nefret bıke, wi ji bo heyata abedin hıltine. **26** Yê ku dıxwaze ji mın re xızmetê bıke, bıla lı dû mın were. Ez lı kûderê me, xızmetçiyê mın ji lı wê derêye. Eger yek ji mın re xızmetê bıke, Bav wi dıde şeref kırınê. **27** Nıha dılê mın teng bûye, ma ez çı bıbêjim? Bıbêjim, ‚Ya Bavê mın, mın ji vê saetê xılas bıke?‘ Ema ez ji bo vê armançê hatım vê saetê. **28** Bavê mın Navê xwe bılınd bıke!“

Lı ser vê yekê jor de deng hat bıhistın û got: „Mın hem bılınd kır û hem Ezê bılınd bıkıım.“

**29** Ew xelkê ku lı wê derê bûn û koma ku ev bıhistın, wan got: „Ezman guregur kır.“ Hınên dın ji gotın: „Mılyaket kê lı tev Îsa qıse kır.“ **30** Îsa got: „Ev deng ji bo mın nıne, ji bo we hat.“ **31** „Ev dınê nıha tê hukım kırınê. Qıralê vê dınê nıha wê bê avêtın der. **32** Dema ku ez lı erdê bılındê jor bûm, hemû insan dıkışınım cem xwe.“ **33** Îsa ev ji bo mırına xwe û ew çawa bı mire got.

**34** Koma insan ji Îsa re wısa got: „Mına ku

me Şeriatê de hu kırıye, gerek Mesih abediyen bimine. Tu çawa dibêji ku „Lawê insan bılindê jor bibe?“ Ev lawê insan ki ye?“

**35** İsa got: „Ronahi hê demekê kurt lı nav we de ye.“ „Bona ku tari we pênegır e, heta ku ronahiya we heye bimeşın. Yê ku tariyê de dimeşın, ew nızanin ku bı kû ve terın. **36** Hê Ronahiya we heyi, iman bı Wê bıkın ku hun bıbın zarokên Ronahiyê.“ İsa ji wan re ev tiştên ha got û çû ji wan dûr ket û xwe veşart.

## **İnad kırına Yahûdiyan**

**37** İsa lı ber çavê wan pır mûcize çêkır, feqet wan disa ji iman bı Wi nekırın. **38** Vana hemû bona ku gotinê Yeşaya peyxamber werın şunê çêbûn:

„Ya Xudan ew xebera ku me da ye, ma ki pê iman kır? Ma quweta Xudan ki re hat nişan dan?“

**39-40** Va ye bo vê yekê wan iman nekır. Çawa ku Yeşaya peyxamber şunde ki din de ji disa dibêje:

„Xudê çavê wan kor kır û dilê wan ji hışk kır. Wisa ku çavê wan nebine, dilê wan ji fehm neke û ew venegerın cem mın û ez ji wan sax nekım.“

**41** Yeşaya peyxamber ev tiştên ha gotine, ji ber ku wi izeta İsa ditiye û bo Wi qıse kırıye. **42** Lı tev vına pır mezin û serokên Yahûdiyan iman bı İsa anin. Feqet wan eşkereyi negot, bona ku wan dizaniya Fêrisi wan ji ibadetxanê bavêjin der. **43** Çımki wan meth kırına insan ji ya xudê zehftır hezkır.

**44** İsa dengê xwe bılind kır û wisa got: „Yê ku iman bı mın dike, iman bı mın nine, iman bı yê ku ez şandime dike.“ **45** „Yê ku ez ditime, ew yê ku ez şandime dibine. **46** Kesê ku iman bı mın dikın, bona ku ew qet lı tariyê de nemınin, ez ronahiti hatım dinê. **47** Ew kesê ku gotinê mın dibihızın û qebûl nakın, ez hukum lı wan nakım. Çımki Ez nehatime ku hukum lı dinê bıkıım, ez bo xılas kırına dinê hatım dinê. **48** Yeki dın heye Ew hukum lı wan kesê ku mın qebûl nakın dike. Kelama ku mın got, roja dawiyê de hukum lı wi kesi dike. **49** Çımki

mın bı xwe û xwe qise nekır. Bavê mın yê ku ez şandım wi emır da mın, ez çawa qise bıkim û çı bıbêjim. **50** Ez zanim ku emirê Wi jiyana abedin e. Jı bo vê yekê Ez çı bıbêjim, mina ku Bav mın re dibêje wisa dibêjim.“

### Temsila dılınzminê

**13** Beri cejna derbazbûnê bû. İsa zani ew saet hatiye ku, ew wê ji vê dinê veqete û here cem Bav. Dinê de yên ku aidê wi bûn, Wi ew hez kırın û heta dawiyê ji hezkır. **2** Çaxê dibû wexta xwarına êvarê iblis xwestına xwe kır dilê lawê Simon Yahudayê İsqaryoti ku, ew İsa bıde dest. **3** İsa zani ku Bav her tışt emanetê Wi kırıye û ew ji ba Xudê hat û disa vegere cem Xudê. **4** İsa ji sıfrê rabû, aba xwe dayni alikê û pêşgir girt lı pıştta xwe pêça. **5** Dû re av kır leganê û lingê şagirtên xwe şuşt û dest pê kır bı pêşgıra ku dabû pıştta xwe ji lingê wan zıwa kır.

**6** Dor hat Simon Petrûs. Simon, ji İsa re got, „Ya Xudan, ma tê lingê mın bışuyi?“

**7** İsa, ji wi re wisa got: „Ez çı dıkım tu vê niha nıkari fehm bıki, feqet dû re tê vê fehm bıki.“

**8** Petrûs, ji İsa re got: „Tu lingê mın qet naşuyi!“ İsa got: „Eger ku ez te neşum, paya te lı tev mın nabe. **9** Simon Petrûs got: „Ya Xudan tenê lingê mın nine, dest û serê mın ji bışu!“

**10** İsa ji wi re got: „Yê ku hatine şuştinê tamamen paqij bûne; xeyri lingan lazım nine ku tıştêkê dın were şuştinê. Hun ji paqijın, feqet hemû paqij ninin.“ **11** İsa zaniya ku ki Wi bıde dest. Jı bo vê yekê got ku: „Hun hemû paqij ninin.“

**12** Dema ku İsa lingê wan hemûyan şuşt, disa aba xwe lı xwe kır û çû lı sıfrê rûnişt. İsa ji şagirtên xwe re got: „Tıştê ku mın ji we re kır, ma hun wi fehm dıkın?“

**13** „Hun ji mın re Mamoste û Xudan dibêjin. Hun rınd dıkın, ji ber ku ez Ew im.

**14** Madem ku Ez Xudan û Mamoste me û disa ji mın lingê we şuşt; hun ji mecbûrin ku lingê hevûdu bışun. **15** Mın ev temsile da we ku hun ji hevûdu re mina mın bıkın.

**16** Jı we re bı rasti bı rasti dibêjim: Kole ji

efendiyê xwe mezintir nine. Yê ku hatiye şiyandin ji ji yê ku ew şandiye mezintir nine. **17** Madem ku hun van tiştan zanin, eger ku hun wan bîkin hunê bextiyar bîbin!, (dilgeş bîbin!)

### **Ji Îsa re ihanet kirin**

(Met.26:20-25; Mer.14:17-21; Lûq.22: 21-23)

**18** „Îsa got, ez ji bo we hemûyan nabêjim, yên ku min bijartine ez wan nas dikim. Feqet bona ku nivisa bimbarek ya ku dibêje: ‚Yê ku nanê min xwar destê xwe bilind min kir‘, were şundê ev hat çêkirin. **19** Ez we re vana ji niha ve dibêjim ku, dema ev tişt çêbûn, hun iman bîkin ku, ez Ew’im. **20** Ji we re bî rasti bî rasti dibêjim, her kijani ez dîşinim, ki ku wan qebûl bike, min qebûl dike. Ki ku min qebûl dike, ew yê ku ez şandime qebûl dike.“

**21** Îsa li dû gotina van tiştan re di rihê xwe de tengasiki kûr bihist. Îsa ji wan re şehadetî kir û got: „Ji we re bî rasti bî rasti dibêjim, ji we yek min dide dest.“

**22** Şagirtan mêze hevûdu kirin, gotin ecê-

ba bo ki dibêje û wan mereq kir. **23** Şagirtan teki xwe da bû singê Îsa. Îsa ew hez dikir. **24** Simon Petrûs îşaret da wi şagirti ku ew pîrs bike ku, Îsa vê ji bo kijan şagirti dibêje. **25** Wi ji xwe da bû singê Îsa, jê pîrs kir û got: „Xudan, yê ku te dide dest ew ki ye?“

**26** Îsa got: „Ez pariyê nênan newq bîkim û bidime kijani, ew e. Û dû re Wi pariyê nan newq kir, û da lawê Simon Îsqaryot Yahûda. **27** Yahûda çawa ku pariyê nan girt, İblis ket hundurê wi. Îsa ji wi re got: „Tiştê ku tu dixwazi biki, zû bike!“ **28** Yê ku li ser sîfrê bûn, tu kesi fehm nekir ku, Îsa bona çî ev çîse ji wi re got. **29** Bona ku kîsikê pera bî Yahûda re bû, şagirtên din gotin ku belkê Îsa ji wi re got: „Bo idê ji me re tiştê ku lazime bikire“, yan ji „tiştê ku feqiran.“ **30** Dema ku Yahûda pariyê nan girt, ew hema derket der. Û Şev bû.

### **Hevûdu hez bîkin**

**31** Dema ku Yahûda çû der, Îsa got: „Lawê insan niha hatiye bilind kirinê.“ „Xudê di wi

de bilind bû. **32** Bona ku Xudê dî Wi de hatiye bilind kîrinê, Xudê ji wê wi li cem Xwe bîde bilind kîrinê, û hema bilind bîke. **33** Zarokno! Ez hê demek kurt li ba we me. Hunê li min bigerin, feqet mina ku min ji Yahûdîyanre got, niha we re ji dibêjim, şuna ku ez terim hun nikarin werin li wê derê. **34** Ez ferman kê nû didim we: Hevûdu hez bîkin. Mina ku min hun hez kîrin, hun ji wisa hevûdu hez bîkin. **35** Eger ku hezkîrîna we ji hevûdu re hebe, wê çaxê herkes wê fehm bîke ku hun şagirtên min in.“

### **Petrûs Îsa inkar dîke**

(Met.26:31-35; Mer.14:27-31; Lûq 22:31-34)

**36** Simon Petrûs ji Îsa re got: „Ya Xudan, ma tu kû ve terî?“ Îsa ji wi re got: „Şunda ku ez terim, tu niha nikari li dû min weri li wê, feqet dû re tê weri.“

**37** Petrûs ji Wi re got: „Ya Xudan, ma çima ez niha nikarim li dû Te werim? Ez ji bo te canê xwe bîdim!“

**38** Îsa ji wi re wisa got: „Tê ji bo min canê

xwe bîdi? Te re bî rasti bî rasti dibêjim: Heta ku tu min sê caran inkar neki, dik bang nade.“

### **Îsa rê ya ku tere ba Xudê ye**

**14** Bîla dilê we teng nebe. Bî Xudê iman bîkin, bî min ji iman bîkin. **2** Mala Bavê min de pir mesken, (cih) hene. Eger ku wisa nebûna, min ji we re bigotana. Çimki ez terim da ji bo we cih hazir bîkim. **3** Biçim, ji we re cih hazir bîkim û ji ber ku hun ji li wê bin dera ku ez lê me; ez disa werim û we bigirim ba xwe. **4** Hun rê ya şunda ku ez terim zanin.“

**5** Tomas ji Îsa re got: „Ya Xudan, em nîzayînin ku tu kû ve terî, ma em rê çawa bîzayînin?“

**6** Îsa ji wi re got: „Rê, rasti û jîyan ez im.“ Ne bî rêberiya min be, qet kes nikare were cem Bav, (Xudê). **7** Eger ku we ez nas bîkirama, we Bavê min ji nas bîkirana. Ji niha ve hun Wi nas dîkin, û we Ew dit.“

**8** Filipûs got: „Ya Xudan, Bav nişan me bîde, û ew ji me re bes e.“

9 İsa got: „Filipûs, ez ev ças zemanê lî tev we me, ma te ez hê nas nekîrim e? Ki ku ez ditîm e, wi Bav ji ditiye. Tu çawa dibêji ku: ‚Bav nişanê me bide?‘ 10 Tu bawer naki ku, ez bî Bav re me û Bav ji bî Mîn re ye? Gotinê ku ji we re dibêjim ez bî xwe û xwe nabêjim, ema Bavê ku mîn de disekîne Ew xebatên xwe dike. 11 Îman bî mîn bîkî ku; ez Bav de me, û Bav ji Mîn de ye. Qet ne be bona van xebatan îman bîkî. 12 We re bî rasti bî rasti dibêjim, ev xebatên ku ez çêdikim ewê ku bî mîn îman dikin ew ji dîkarin van xebatan çêbîkî, heta dîkarin ku yê mezintir ji çêbîkî. Çimki ez terîm cem Bav. 13 Bona ku Bav di Law de bîlînd bibe, hun bî navê mîn çî bîxwazî, ez çêbîkîm. 14 Eger ku hun bî navê mîn tiştêk bîxwazî, ezê wê bîkîm.

### Wad kîrîna Rihê bîmbarek

15 Eger ku hun ji mîn hez bîkî, emîrê mîn binî şunê. 16-17 Ez ji ji Bav rîca bîkîm û Ew ji, Teselîdar kê dîn, Rihê heqîqetê, bide we; wîsa ku Ew tîmî lî tev we bîsekîne. Dî-

nê nîkare Wî qebûl bîke. Çimki ew ne dikare ku Wî bîbine, û ne ji Wî nas dike. Hun Wî nas dikî. Çimki Ew lî ba we disekîne û wê di hindurê we de bibe. 18 Ez we sêwî nahêlînim, disa vedigerîm cem we. 19 Hê Hinek zeman dîn dinê êdî mîn nabîne, feqet hunê mîn bibînî. Madem ku ez dijîm hun ji hunê bîjî. 20 Wê rojê hunê fehm bîkî ku, ez Bav de me û hun bî mîn re ne û Ez ji bî we re me. 21 Ewê ku emîrên mîn bî wî re ne û wan tîne şunê, ew ji mîn hez dike. Yê ku mîn hez dike, Bavê mîn ji wî hez dike. Ez ji wî hez dikîm û xwe nişanê wî didîm.“

22 Yahûdayê (Îsqaryoti nine) ji İsa pîrs kir û got: „Ya Xudan, çawa dibe ku Tu xwe ji dinê re nine, ji me re nişan bîdî?“

23 İsa ji wî re wîsa got: „Ki ku ji mîn hez dike, gotîna mîn dike, Bavê mîn ji wî hez dike. Em ji tîn ba wî û lî cem wî mesken çêdikî. 24 Ki ku mîn hez neke gotinê mîn nake. Ev gotîna ku we bîhist ya mîn nine, feqet ya Bavê ku ez şandî me.“

25 „Ez hê lî ba we, mîn ji we re ev tiştê gotî. 26 Feqet Teselîdar, Rihê bîmbarek,



Yê ku Bav bı navê min bişine, Ew wê ji we re her tiştê bide fehm kîrinê û hemû gotinê min bine bira we.“ **27** Ji We re selametiye dihêlinim, ez selametiya xwe didim we. Ez mina ku dinê dide nadim. Bila dilê we teng nebe û netirse. **28** We bihist ku min ji we re got: ‚Ez terim, feqet disa werim ba we.‘ Eger ku we ji min hez bîkirana, bona ku ez terim cem Bav, hunê dilşa bibûna. Çimki Bav ji min mezintir e. **29** Ê bona ku dema ev tişt bîbin, hun iman bîkin, hê ev tişt nebûyin min niha ji we re got. **30** Ez êdi li tev we pîr tiştî qise nakim; çimki reisê vê dinê tê; û bi min re qet tiştêkê wi tune. **31** Feqet bila dinê bizane ku, ez ji Bav hez dikim, û Bav çawa emir dide min, ez ji wisa dikim. Rabin, em ji vir herin.

### Mêwa rez û şivên wê

**15** „Ez mêwa rastim û Bavê min ji rezvan e. **2** Her şivmêwa ku bi min ve ye û meywe nade, Bav wan jê dike; û yên ku meywe didin, bona ku hê zêde bîdin wan paqij dike. **3** Bî gotina ku min we re

gotiye, hun bı rasti paqij in. **4** Hun bı Min re bisekînin û ez ji bı we re. Eger ku şivmêw bı mêwê ve nesekine, bı xwe û xwe nikare meywe bide. Mina vê, eger ku hun bı min re nesekînin, nikarin meywe bîdin. **5** Ez mêw im, hun ji şivmêw in. Kesê ku bı min re disekîne û ez ji bı wi re bisekînim ew pîr meywe dide. Çimki hun bê min nikarin qet tiştêkê bîkin. **6** Eger kesek bı min re nesekîne, mina şivmêwê davêjin der û hişk dibe. Wan top dikin davêjin agir û ew dişewitin. **7** Eger ku hun bı min re bisekînin û gotinê min ji di we de bîskînin, wê çaxê hun her çi bixwazin wê ji we re were dayinê. **8** Dema ku hun pîr meywe bîdin, Bavê min bı vê bilindtir dibe. Hun wisa dibin şagirtên min.

**9** „Mina ku Bav ji min hez kir, min ji hun wisa hez kîrin. Li hez kîrîna min de bisekînin. **10** Eger ku hun emirê min binin şunê, hez kîrîna min de disekînin; mina min emirê Bavê xwe anin şundê û hez kîrîna Wi de sekînim... **11** Min vana ji bona ku şabûniya min li we de hebe û şabûniya we ji temam bibe gotin. **12** Emrê min ev e:

Mina ku mın hun hez kırın, hun ji hevûdu wisa hez bıkın. **13** Qet lı kesi de hez kırına ku canê xwe oxıra hevalê (dostê) xwe de bide, ji wê hez kırinê mezintır hez kırın tune. **14** Eger emrê ku mın dane we hun wan bıkın, wê çaxê hun dibın dostên mın. **15** Êdi ez ji we re nabêjim xulam, çımki xulam nızane ku efendiyê wi çı dıke; feqet mın ji we re dost got; çımki hemû tıştê ku mın ji Bavê xwe bıhist ji we re dan zanin. **16** We ez nebıjartım, feqet mın hun bıjartın. Mın hun tayin kırın ku, hun herın meywe bıdın û meywe yê we ji baqi bımine. Wisa ku, hun bı navê mın ji Bav çı bıxwazın, Ew wê bıde we. **17** Ez vı emrı dıdım we, da hun hevûdu hez bıkın!“

### Nefret kırına dınê

**18** Eger ku dınê ji we nefret bıke, bızanın ku beri we ji mın nefret kırıye. **19** Eger ku hun daxılê dınê bûna, dınê yên ku daxılê wi ne wan hez dıke. Madem ku, hun daxılê dınê nının; encax mın hun ji dınê vebıjartın e. Ji bo vê yekê dınê ji we nefret dıke. **20** Gotına

ku mın ji we re got, bının bira xwe: ‚Xulam ji efendiyê xwe mezintır nine.‘ Eger ku wan ji mın zulum kırıne, wê ji we re ji zulumê bıkın; eger ku gotınê mın qebûl kırıne, ewê yên we ji qebûl bıkın. **21** Feqet hemû van tıştan dı rûbalê navê mın de wê bı we bıkın, çımki ew wi yê ku ez şandıme nas nakın. **22** Eger ku ez nehatıma û ji wan re negotana, gunehên wan wê nebûna; feqet nıha bona gunehên wan efûbûn ji wan re tune. **23** Kesê ku ji mın nefret dıke, ji Bavê mın ji nefret dıke. **24** Eger mın xebatê ku kesi nekırıye lı nav wan de çênekırına, gunehên wan wê nebûna; feqet wan nıha hem dıtın û hem ji ji mın û Bavê mın nefret kırın. **25** Feqet ev bo gotına ku şeriata wan de hatiye nıvısın, were şunê bû: ‚Bêsebeb wan ji mın nefret kır.‘ **26** Teselıdarê ku Ez ji Bav ji we re bışınım, Rıhê heqıqetê, dema ku were, Ew wê ji bo mın şehadeti bıke. **27** Hun ji şehadetiye bıkın. Çımki hun ji dest-pêkê ve lı tev mın bûn.

**16** Mın ev tıştên ha ji we re gotın ku, hun tılpeki nebın. **2** Wê we ji iba-

detxanan bıkın der. Erê, saet tê, herkesê ku we dikujın zan dıkın ku ew ji Xudê re xızmetê dıkın. 3 Û Ew wê van tıştan bıkın, çımki wan ne Bav nas nekır û ne ji ez nas kırım. 4 Feqet mın ev tışt ji we re gotın da çaxê saeta wan bê hun wan bının bira xwe. Mın ew tışt di destpêkê de ji we re negotın. Çımki ez tev we bûm.

### Şuxul kırına Rihê Bimbarek

5 Lê belê niha ez terım cem yê ku ez şandım e; û li nav we de qet kesek nabêje ku: „Ma Tu kû ve teri?“ 6 Feqet bona ku mın ji we re ev tışt got, dilê we tiji keder bû. 7 Ji we re rastiye dibêjim ku; çûyına mın ji bo feyda we ye. Eger ku ez neçım, Teselidar nayê ba we. Eger ku ez biçım, Wi ji we re biçınım. 8 Û dema ku Ew were, ji dinê re guneh, rasti û hukum kırınê nişan bide. 9 Ji bona guneh, çımki bı mın iman nakın. 10 Bona rastiye, çımki ez terım cem Bav û hun êdi mın nabinın. 11 Ji bona hukum kırınê, çımki reisê vê dinê hatiye hukum kırınê.

12 Ji we re hê pır gotinê mın hene, feqet hun niha nıkarın ku wan ragırın. 13 Feqet Ew, Rihê rastiye were, Ew wê rê ya her heqıqetê nişan we bide; Ew bı xwe û xwe qıse nake; feqet ew çı bıbıhize dibêje û hatına tıştê pêşende xeberê bide we. 14 Ew wê mın bilınd bıke. Çımki Ew wê ji yê mın bıgire û xeberê bide we. 15 Her çı tıştê Bav heye, ew yê mın e. Ji bo vê mın ji we re got: „Ew wê ji yê mın bıgre û bide we.“

16 Zemanek kurt, û hun mın êdi nabinın; û disa zemanek kurt, û hunê mın bıbının.

### Elema we dıbe şabûni

17 Wê çaxê hın şagirtên wi ji hevûdu re wısa gotın: „Zemanek kurt, û hun mın nabinın, û disa zemanek kurt, û hunê mın bıbının, û: Çımki ez terım cem Bav. Ma ew çı ye ku ji me re dibêje?“ 18 Wısa ku: „Zemanek kurt got, ev çı ye? Em nızanin ku, Ew çı dibêje.“

19 İsa fehm kır ku ew dıxwazın ji wi pırs bıkın; û ji wan re got: „Mın got zemanek kurt, û hun mın nabinın, û disa zemanek

kurt, û hunê mın bıbinın. Ma hun ji bo vê gotinê ji hevûdu pırs dıkin?“ **20** Ez ji we re bı rasti bı rasti dibêjim: „Hunê bıgırın û li xwe bıdın, dinê ji wê kêf bıke. Hunê kedere bıkışının, feqet kedera we wê bıbe şabûni. **21** Dema ku jınık zarok tine dinê êş dıkişine. Çımki saeta wê hatiye. Feqet dema ku zarok ani dinê, bona ku insanek ani dinê, ew şabûn dıke û êşa xwe ji bir dıke. **22** Mina vê temsilê niha kedera we heye , feqet ezê we disa bıbinım û dilê we şabıbe. Û şabûniya we kes nıkare ji we bıgır e. **23** Wê rojê hun tu tışt ji mın napırsın. Ji we re bı rasti bı rasti dibêjim: Bı navê mın hun ji Bav çı bıxwazın, Ew wê bıde we. **24** Heta niha We bı navê mın tu tışt nexwest. Bıxwazın, û hunê bıgırın. Wısa ku, şabûna we tamam bıbe.

**25** Mın ji we re ev tıştên ha bı meselan gotın; saet tê ku, ez êdi ji we re bı meselan nabêjim; feqet derbarê Bav de Ezê ji we re bı eşkereyi bıdım zanın. **26** Ez nabêjim, di wê rojê de hunê bı navê mın bıxwazın; û ezê ji bo we ji Bav bıxwazım. **27** Çımki bona ku hun ji mın hez dıkin û we iman kır

ku ez ji Bav derketım û hatım e, Bav bı xwe ji ji we hez dıke. **28** Ez ji Bav derketım û hatım dinê. Niha ji dinê berdıdım û vedıgerım cem Bav.“

**29** Şagırtan got: „Va ye, tu niha eşkereyi dibêji û qet bı meselan qıse naki.“ **30** „Em niha fehm dıkin ku tu hemû tıştı dızani. Hewce nine ku kesek ji te bıpıirse. Em ji bo vê iman dıkin ku tu ji Xudê hati.“

**31** İsa ji wan re got: „Ma hun niha iman dıkin?“ **32** „Va ye, saet tê, erê, ew saet hatiye û hunê mın tenê berdın, belav bıbın û her yek ji we wê here cem yên xwe. Feqet ez tenê ninım, çımki Bav li tev mın e. **33** Bona ku sılameta we bı mın re hebe, mın ev tışt ji we re gotın. Dı dinê de kedera we heye. Feqet cesûr bıbın. mın dinê mexlûb kır!“

## İsa Dua kır

**17** İsa ev tışt gotın; çavê xwe bılındê rûyê ezman kır û wısa got: „Ey Bav, saet hat. Lawê xwe bılınd bıke ku, Law ji te bılınd bıke. **2** Çımki te li ser hemû beşe-

rê de selahiyet da Wi. Ta ku, Ew jiyana abedin bide hemû kesên ku te dane wi. **3** Jiyana abedin ji ew e ku, ew tek Xudê yê rastiyê te û yê ku te şandiye Îsa Mesih nas bikin. **4** Bı tamam kırına xebata ku te ji bo çêkırinê da min, min tu li ser rûyê erdê bilind kiri. **5** Û, ey Bav, dema ku dinê hê tune bû û izeta min ya ku li ba te bû, niha bı wê min li cem xwe bilind bike.“

**6** Ji dinê ew mirovên ku te dan min, ji wan re min navê te nişan da. Ew yê te bûn, te ew dan min û wan soza te qebûl kir. **7** Ew niha zanin ku hemû tiştê te dan min, ew ji te ne. **8** Çimki sozê ku te dan min, min ji dan wan; û wan ji qebûl kir. Wan bı rasti fehm kir ku ez ji te derketim û hatim. Wan iman kir ku, te ez şandim e. **9** Ez ji bo wan rıca dıkım; ji bo dinê nine, feqet ji bo yên ku te dan min rıca dıkım. Çimki ew yên te ne. **10** Hemû tiştên min yên te ne, yên te ji yên min in; û ez di wan de hatim bilindkırın. **11** Ez êdi ne di dinê de me, feqet ew di dinê de ne, û ez tēm ba te. Ey Bavê bimbarek, ew kesê ku te dan min bı navê xwe bıparêzine ku, ew ji mina me bıbın

yek. **12** Dema ku ez ba wan bûm, min ew bı navê te yê ku te dabû min hêvişandin (parastın). Bona ku soza bimbarek were şundê; ji xeyri lawê mirinê, ji wan kesek dın helak nebû.

**13** Feqet ez niha tēm ba te. Ez van tiştan di dinê de dibêjim ku, şabûniya min di wan de tamam bıbe. **14** Min soza te da wan û dinê ji ji wan nefret kir. Çimki çawa ku ez ne daxilê dinê me, ew ji daxilê dinê ninin.

**15** Ez bona ku tu wan ji dinê rabiki nine, bona ku tu wan bıparêzini rıca dıkım.

**16** Çawa ku ez ne daxilê dinê me, ew ji daxilê dinê ninin. **17** Wan bı rastiyê bimbarek bike. Û soza te heqiqet e. **18** Mina ku te ez şandim dinê, min ji ew wisa şandin dinê. **19** Di oxira wan de ez xwe teqdis dıkım ku, ew ji bı heqiqetê bēn bimbarek kırın ê.

**20-21** Tenê ji bo wan nine, feqet ji bo yên ku bı soza wan bı min iman bikin ji, bona ku hemû yek bıbın, rıca dıkım. Çawa ku, ey Bav, tu bı min re yi û ez ji bı te re me, ew ji bı me re bin ku, dinê iman bike ku te ez şandim e. **22** İzeta ku te da min, min da wan ku, ew ji mina me yek bıbın. **23** Ez bı

wan re, û tu ji bı mın re, wisa ku hemû ji bona yekitiyê tamam bıbin ku; dinê fehm bike te ez şandım û mina ku mın hez diki wisa wan ji hez diki. **24** Ey Bav, ez dixwazım yên ku te dane mın, ew ji li şuna mın de li tev mın bıbin ku, ew izeta mın ya ku te da mın bıbinın. Çımki te ez beri çêbûna dinê hezkırım. **25** Ey Bavê adil, dinê tu nas nekiri, feqet mın tu nas kiri; û wana ji zanin ku te ez şandım e. **26** Bona hezkırına te ya ku ji bo mın heye, di wan de ji be, û ez ji bı wan re bı; mın navê te ji wan re da zanin û ezê bıdim zanin ê.

### Îsa tê girtinê

(Met.26:47-56; Mer.14:43-50; Lûq.22:47-53)

**18** Îsa dû gotina van tıştan re derket û li tev şagirtên xwe çû wi aliyê ne-wala Kidron ê. Li wê derê baxçek hebû. Îsa û şagirtên xwe hatin nav wi baxçe yi. **2** Êwê ku Îsa da dest Yahûda ji ew şunde dızeniya. Çımki Îsa û şagirtên xwe li wê derê hevûdu pır caran dıditin. **3** Bı vi awayi Yahûda, givalek esker û memûr ji serokê

Kahinan û Fêrisiyan girt û hat wê derê. Destê wan de fanos, meşhele û sileh hebûn.

**4** Îsa, hemû tıştê ku bihatina serê wi dızeniya. Derket pêşiyê ji wan pırs kır û got: „Ma hun li ki digerin?“

**5** Wan ji got: „Li Îsa yê Nisreti.“

Îsa ji wan re got: „Ez im.“

Yê ku Ew da dest Yahûda ji bı wan re sekini bû. **6** Îsa, dema ku ji wan re got:

„Ez im“, şunda çûn û ketin erdê.

**7** Ji ber vê yekê Îsa ji wan disa pırs kır û got: „Ma hun li ki digerin?“

Wan got: „Li Îsa yê Nisreti.“

**8** Îsa, ji wan re got: „Mın ji we re got: Ku Ez im“. „Eger ku hun li mın digerin, vana berdın bıla herin.“ **9**. Ji ber ku gotina wi ya berê gotibû: „Ew kesên ku te dan mın, qet kesek mın wında nekır“, were şundê; wi wisa got.“ **10** Şûrkê Simon Petrûs hebû, wi ew kışand û li xızmetkarê serokê kahinan xıst û kerika wi ya rastê jê kır. Navê wi xızmetkari Malhûs bû.

**11** Îsa ji Petrûs re got: „Şûrê xwe bike qalanê! Fincana ku Bavê mın daye mın, ma ez venexwım?“

12 Bı vi awayi givale, serdar (qumandar) û memûrên Yahûdiyan İsa girtin û girêdan.  
13 Wan İsa pêşi birin cem Henna; xezûrê Qayfa yê ku wê salê serokê kahinan bû.  
14 Ewê ku şîret (nesihet) kir û ji Yahûdiyan-re gotibû; di oxira gel de mîrîna mirovekê ji bo me xêr e, Qayfa ev bû.

### **Petrûs İsa inkar dıke**

(Met.26:69-70; Mer.14:66-68; Lûq.22:55-57)

15 Simon Petrûs û şagirtêki dın li dû İsa çûn. Bona ku ew şagirt nasê serokê Kahinan bû, li tev İsa ket hewşa serokê Kahinan. 16 Feqet Petrûs li der ve, cem dêri de sekini bû. Ew şagirtê ku serokê Kahinan nas dikir, çû li tev dergevan qise kir û wi Petrûs ji bir hindur. 17 Dergevan keçikê ji Petrûs re got: „Yan tu ji daxilê şagirtên vi mirovi yi?“

Petrûs ji got: „Na, ez şagirtê wi ninim.“

18 Bona ku hewa sar bû, xızmetkar û memûran bı komirê agir vêxistibûn, û li ber sekini bûn û xwe germ dikirin. Petrûs ji li tev wan sekini bû û xwe germ dikir.

### **Pırs kırına serokê kahinan**

19 Wê demê serokê kahinan, ji bona şagirt û hu kırına İsa, jê pırs kir. 20 İsa ji wisa got: „Mın ji dinê re eşkereyi got. Mın tım ibadetgeh û ibadetxaneyên ku hemû Yahûdi kom dibin ders da; û mın veşarti tu tişt negot. 21 Ma çıma tu ji mın pırs diki? Yê ku qise kırına mın bihistine, ji wan pırs bıke. Ew zanin mın çı gotin e.“

22 Ê li dû gotına van tiştan re, li nav wan memûrê ku li wê derê sekini bûn yeki ji İsa re got: „Ma Tu ji serokê kahinan re wisa cewab dıdi?“ û şamarek lê xıst.

23 İsa ji wir re got: „Eger ku mın nerast gotiye, bo nerastiyê şhadeti bıke; eger ku raste, ma tu çıma li mın dixi?“

24 Ji ber vê yekê Henna Ew girêdayi şand cem serokê Kahinan Qayfa.

### **Petrûs İsa disa inkar dıke**

(Met.26:71-75; Mer.14:69-72; Lûq.22:58-62)

25 Simon Petrûs hê cem agir sekini bû û xwe li wê derê germ dikir. Wan ji Petrûs re got: „Ma tu ji şagirtê Wi nini?“

Petrûs inkar kîr û got: „Na, ez şagirtê Wi ninim.“

**26** Xızmetkarkê serokê Kahinan, lî tev wi xızmetkarê ku Petrûs kerik jê kiribû eqrebe bûn. Wi xızmetkari jî Petrûs re got: „Ma mîn lî nav baxçe de tu jî tev wi nediti?“

**27** Petrûs disa inkar kîr û derhal dik bang da.“

### **Pîrs kîrîna Pilato**

(Met.27:1-2,11-31; Mer.15:1-20; Lûq.23:1-5,13-25)

**28** Sibê de zû Yahûdiyan Îsa lî cem Qayfa girtin û birin qonaxa hukumatê. Jî ber ku mirdar nebîn feqet nanê derbazbûnê bixwarîna, ew neçûn hindur qonaxa hukumatê. **29** Jî ber vê yekê Pilato derket, hat cem wan û got: „Ma hember vi mîrovî şîkayeta we çî ye?“

**30** Wan jî Pilato re wîsa got: „Eger ev mîrov xîrabi nekîrana, me ew jî te re netaniya.“

**31** Pilato jî wan re got: „Hun wi bigîrin, lî gora şeriata xwe wi hukum bîkin.“

Yahûdiyan jî Pilato re got: „Jî me re ne caize ku em kesekî bikujin.“

**32** Jî bo ew îşaret bîkin ku Îsa bî çî şîklê mîrînê bîmre, da ew gotina ku Îsa gotibû were şundê, ev çêbûn.

**33** Pilato disa çû hindur qonaxa hukumatê. Wi bang Îsa kîr û Jê re got: „Ma qralê Yahûdiyan tu yî?“

**34** Îsa wîsa got: „Tu vîna bî xwe dibêji, yan kesên dîn jî bo mîn jî te re gotin?“

**35** Pilato got: „Ma ez Yahûdî me?“ „Xelkê Te û serokê Kahinan tu teslimê mîn kîrin. Ma Te çî kîriye?“

**36** Îsa got: „Qraltiya mîn lî vê dînê nine.“ „Eger ku Qraltiya mîn lî vê dînê de bîbûna, xızmetkarên mîn wê lî hember Yahûdiyan bîxebîtina ku ez neketam dî destên wan de; feqet nîha qraltiya mîn lî vîr de nine.“

**37** Pilato Îsa re got: „Ma balê Tu Qral î?“ Îsa got: „Tu dibêji ku ez Qral im.“ „Ez bona vê bûm e, û hatime dînê ku jî bo rastiyê şehadetiyê bîkim. Hemû kesê ku rastiyê de ne, ew dengê mîn dibîhîzin.“ **38** Pilato jî Îsa re got: „Ma rasti çî ye?“

Dû vê pîrsê re Pilato disa derket, çu cem Yahûdiyan. Jî Wan re got: „Ez lî wi de çet sûceki nabinim.“ **39** „Feqet cejna derbaz-



bûnê de ez tîm ji bo we keseki (serbest) berdidim û ev adeta we ye; ma hun dixwazîn, ez Qralê Yahûdiyan ji bo we berdîm?"

**40** Ji ber vê yekê disa kîrîn qîrîn û gotî: „Vi mirovi nine, feqet em dixwazîn ku tu ji me re Barabbas berdi!“ Hal bû ko Barabbas haydut bû.

### Tacê stîrîn

**19** Wê çaxê Pilato Îsa girt û lêxist. **2** Eserkeran ji stîriyan tacek vegirtin û dane serê Wi. Dû re xeftanek mor ji wi re dan xwe kîrîn ê. **3** Ew hatin ba wi û gotî: „Biji Qralê Yahûdiyan!“ û ew şîlpax kîrîn.

**4** Pilato disa çû der û wan re got: „Va ye, mîn ew ji we re ani der ku, hun bîzanîn mîn li wi de qet sûcek neditiye!“

**5** Li ser vê yekê Îsa, tacê stîrîn li serî bû, xeftanê mor ji xwe kiribû û çû der. Pilato ji wan re got: „Va ye, ew mirov!“

**6** Dema ku serokê kahînan û memûran ew ditîn, qîrîn kîrîn û gotî: „çarmixê bixîne, çarmixê bixîne!“

Pilato ji wan re got: „Hun wi bigîrîn û bi

xwe wi li çarmixê bixînin!“ Çimki, „mîn wi de qet sûcek nedît!“

**7** Yahûdiyan ji wi re wisa gotî: „Qanûnek ya me heye; li gora wê qanûnê gerek e ew bimir e. Çimki wi got ku ez Lawê Xudê me.“

**8** Pilato dema ku ev gotîn bîhist, hê bêtir tîrsiya. **9** Û disa çû qonaxa hukumatê û ji Îsa re got: „Tu ji kû yi?“

Îsa bersiv neda wi.

**10** Pilato ji wi re got: „Ma Tu bî mîn re qise naki?“ „Ma Tu nîzani ku, ji bo berdana te selahiyeta mîn heye, û ji bo xaçkîrîna te ji selahiyeta mîn heye?“

**11** Îsa ji wi re wisa got: „Eger ku te re ji jor de nehatibûya dayînê, qet selahiyeta te li ser mîn wê tune bûya.“ „Ji ber vê yekê, yê ku ez teslimê te kîrîm, gunehê wi hê mezintir e.“

**12** Ji bo vê yekê Pilato xweste ku Îsa berde. Feqet Yahûdiyan kîrîn qîrîn û gotî: „Eger ku tu vi Mirovi berbîdi, tu dostê Qeyser (Sezar) nîni!“ „Ki ku bibêje ez Qralîm, ew hember Qeyser derketiye.“

**13** Pilato ji dema ku ev gotî bîhist, wi Îsa

derxist der. Lı şuna ku navê wê kevir ra-xıstın – feqet bı İbrani Gabbata ye – lı ser kursiyê hukum kırınê de rûnişt. **14** Ew roj tedarık kırına cejna derbazbûnê bû. Saet devdevi şeşan bû. Pilato ji Yahûdiyan re got: „Va ye, Qralê we!“

**15** Feqet wan kır qirin û got: „Wi rabıke! û çarmixê bixine!“

Pilato ji wan pırs kır û got: „Ma ez Qralê we çarmixê bixinim?“

Serokê Kahinan cewab dan û gotın: „Xeyri Sezar Qralê me tune!“ **16** Wê gavê Pilato İsa teslim wan kır ku, ew wi lı çarmixê bixinın.

## **Xaçkırına İsa**

(Met.27:32-44; Mer.15:21-32; lûq.23:26-43)

**17** Wê demê eskeran İsa girtın; Wi, xaçê xwe girt û çû şunda ku navê wê hestiyê seri bû û – bı İbrani ji Golgota ye.**18** Wan ew lı wê derê çarmixê xıstın. Lı tev İsa du mirovê dın ji çarmixê xıstın; İsa navinê de, yên dın ji yek lı aliyê rastê û yek ji lı aliyê çepê de çarmixê xıstın. **19** Pilato levhek ji

nivisand û ew lı ser xaçê de dar xıst. Wi wisa nivisand.

## **„İsa yê Nısreti, Qralê Yahûdiyan!“**

**20** İsa yê Nısreti, Qralê Yahûdiyan! Şunda ku İsa lı çarmixê xıstıbûn, nêzikê bajêr bû. Wisa nivisa ku bı zımanê İbrani, Latin, Yûnani hatıbû nivisandinê, pır kesên Yahûdi ew xwandın. **21** Ji ber vê yekê serokên kahinên Yahûdiyan ji Pilato re gotın: „Qralê Yahûdiyan nine“, feqet wisa bınivisine: „Vi mirovi bı xwe got, Ez Qralê Yahûdiyan ım.““

**22** Pilato ji Yahûdiyan re got: „Mın çı nivisiye, ew hatiye nivisandin.“

**23** Dema ku eskeran İsa lı çarmixê xıst, kincên Wi jê girtın. Wan ew kır çar hêse ku, her yeki re hêsek bıkeve. Kirasê Wi ji girtın. Ew kiras qumaşek ser bı ser bê dırûn bû. **24** Wan ji ji hevûdu re gotın: „Em vına qış nekin, feqet em bo vi vijag bavêjin ku hela ew hêsa ki dıkeve.“

Ew bona ku ev nivisina bimbarek were şunê hat çêbûnê:

## **Esker kincên İsa navbere xwe de pardikın**

„Wan kincên mın lı navbera xwe de par ve kırın, lı ser kırasê mın vijag avêtın.“

Eskeran ew tışt kırın. **25** Lı cem xaçê İsa ji dayêka wi û xuşka dayêka wi, pireka Klo-pa Meryem û Meryema Mejdela ni sekinin bûn. **26** Ê dema ku İsa dêya xwe û ew şa-girtê ku wi hez dikır dit, ji dêya xwe re got: „Jinikê, va ye, lawê te!“ **27** Dû re şagirt re got: „Va ye, dêya te!“

Jı dû wê saetê re wi şagirtê, Meryem girt mala xwe.

## **Mırına İsa**

(Met.27:45-56; Mer.15:33-41; Lûq.23:44-49)

**28** Dû re, İsa êdi dızaniya ku niha her tışt tamam bû ye, bona ku nivisa bimbarek were şundê, got: „Ez ti bûm!“ **29** Lı wê derê qabek bı sirkê tiji hebû; sungerek bı sirkê tiji kırın, guliya zûfêre kırın û dan devê Wi. **30** Dema ku İsa sirke girt, got: „Temam bû!“ û serê xwe xar kır û rihê xwe da.

**31** Bona ku roja hazır kırinê bû, ji ber ku ceset roja Sebtê di xaçê de neminin, (çımki ew roja Sebtê rojekê mezın bû); Yahûdiyan ji Pilato rıca kırın ku ew çêqê wan bide şıkandın û bide helanin. **32** Wê demê esker hatın çêqê wan her du mirovê ku lı tev İsa hatibûn xaçkırinê şıkandın. **33** Feqet dema ku ew hatın cem İsa, wan dit ku ew mırı ye. Bo wê yekê eskeran çêqê wi neşıkandın. **34** Lêbelê, disa ji eskerkê pê rım tenışta wi qul kır. Ji tenışta wi hema xwin û av heriki. **35** Ew mirovê ku ev dit şhadeti kır û şhadetiya wi ji rast e. Ew bı xwe zane ku wi rasti gotiye. Bona ku hun ji iman bıkın, wi şhadeti kiri ye. **36** Çımki ew tışt bona ku nivisa bimbarek: „tek hestiki wi naşike.“ were şundê, çebûn. **37** Ê disa nivisekê dın wısa dibêje: „Mirovê ku wan bedena wi qul kiri ye, wê mêze wi bıkın.“

## **Hılanin û definkırına İsa**

(Met.27:57-61; Mer.15:42-47; Lûq.23:50-56)

**38** Pıştı van tıştan şagirtekê İsa, yê ku ji tırısa Yahûdiyan xwe veşarti bû, ji Erime-

tiyê navê wi Ûsif bû, ji bo hılanina cesedê Îsa, ji Pilato rîca kir û Pilato ji izın da. Û Ûsif hat, cesedê Îsa rakir. **39** Ew mirovê ku pêşi bî şev hatibû ba Îsa, Nikodim ji nêzika sed litir miska tevlihev û darê zendeqê girt û hat. **40** Wê demê wan cesedê Îsa girt li ser adeta definkirina Yahûdiyan, ew tev biharat li caw pêçandin. **41** Şunda ku Îsa li çarmixê xistibûn baxçek hebû, û di nav wi baxçeyi de ji mezelek nû hebû ku, hê tu kes nekiribûnê. **42** Û bona ku ew roj bo Yahûdiyan ya hazır kirinê bû, wan Îsa kir wê derê; çimki mezel nêzik bû.

### Îsa ji mırinê radibe

(Met.28:1-8; Mer.16:1-8; Lûq.24:1-12)

**20** Di roja heftiyê ya pêşi de zû, hê tari bû, Meryema Mejdalani hat mezelê. Wê dit ku kevîrê derê mezelê de hatiye rakirin. **2** Wê demê ew revî hat cem Simon Petrûs û şagirtê dîn yê ku Îsa jê hezdikir, û ji wan re got: „Xudan ji mezelê rakirine, û em nizanin ku, ew kirine kû derê.“

**3** Petrûs li tev wi şagirtê dîn derketin û ber-

bî mezelê çûn. **4** Her du ji bî hevûdu re revin; feqet ew şagirtê dîn ji Petrûs pîtir lez revî, û berî ew gehişt mezelê. **5** Wi xwe xar kir mêze hindurê mezelê kir, paçê caw li erdê raxisti dit; feqet neçû hindur. **6-7** Wê demê li dû wi re Simon Petrûs ji hat û ew çû hindurê mezelê. Wi ew cawê ku li erdê bû û dismala ku serê Îsa pêcabûn dit. Dismal li tev caw, (kefen) nebû, cê di şunde kê dîn de lif kirî, (bî hevre pêçandi) sekini bû û wi ew wisa dit. **8** Wê demê ew şagirtê dîn yê ku berî gehiştibû mezelê ji ket hindur dit, û iman kir. **9** Çimki wan ew nivisa bimbarek ya ku dibêje Îsa ji mırinê radibe, hê nedizanın.

### Îsa ji Meryema Mejdalani re xuya kir

(Met.28:9-10; Mer.16:9-11)

**10** Wê wextê şagirt disa çûn mala xwe.

**11** Feqet Meryem giriya û der ve cem mezelê sekini. Dema ku ew giriya xar bû û mêze hindur mezelê kir. **12** Wê du milyaketê ku kincê sîpi li xwe kiribûn dit; ew cem cesedê Îsa, yek ji aliyê serî û yek ji aliyê

lingan rûniştibûn. **13** Wan ji Meryemê re got: „Jinikê tu çima digiri?“

Wê ji ji wan re got: „Xudanê mîn rakirine, û ez nizamim ku ew kirine kû derê.“

**14** Lî dû vê gotinê re, wê mêze paş xwe kir û dit ku Îsa lî vê sekini ye. Feqet Meryemê fehm nekir ku Ew Îsa ye. **15** Îsa ji wê re got: „Jinikê ma tu çima digiri?“ „Ma tu lî ki digeri?“

Wê ji zen kir ku Ew baxçevan e, û ji wi re got: „Efendi, eger ku te Ew biriyê, ji mîn re bibêje te Ew kiriyê kû derê ez ji herim Wi rabikim.“

**16** Îsa ji wê re got: „Meryem!“

Ew ji vegeri û bî zimanê İbrani got: „Rabbûni!“ mana Rabbûni, ‚Mamoste‘ye.‘

**17** Îsa ji wê re got: „Destê xwe nede Mîn!“ „Çimki ez hê derneketime ba Bav; feqet tu here cem birayên mîn, û ji wan re bibêje: „Ez derdikevim ba Bavê xwe û Bavê we, ba Xudê yê xwe û Xudê yê we.“

**18** Meryema Mejdalani çû cem şagirtan. Ji wan re got: „Mîn Xudan dit!“ Dû re tiştê ku Xudan ji wê re gotibûn, wê ji ew şagirtan re gotin.

## Îsa ji şagirtên xwe re xuya kir

(Met.28:16-20; Mer.16:14-18; Lûq.24:36-49)

**19** Ew roj, raja heftiyê ya pêşî de, dema ku êvar bû, derê mala ku şagirtên Îsa tê de bûn ji tîrsa Yahûdiyan girti bû; û Îsa hat, lî nav wan de sekini û ji wan re got: „Selamet ji we re!“

**20** Ev got, dest û teniştê xwe nişanê şagirtên Xwe dan. Şagirtan ji Xudan dit û dilşa bûn. **21** Îsa disa ji wan re got: „Selamet ji we re!“ „Mina ku Bav ez şandim e, ez ji we dîşinim. **22** Dema ku wi ev got, pîfîr wan û got: „Rihê miqaddes bistinin! **23** „Hun gunehên ki efu bikin, ef dibe; û hun gunehên ki efu nekin, ef nabin û disekin.“

## Îsa ji Tomas re ji xuya kir

**24** Tomas, yê ku jê re digotin, „Zo“ (Didimos) ew ji daxilê diwazdehan bû; û dema ku Îsa hat ew lî tev wan şagirtên din nebû. **25** Wan şagirtên din ji wi re gotin: „Me, Xudan dit!“

Feqet Tomas ji wan re got: „Heta ku ez şu-

na mîxan dî destên Wi de nebinim, û bê-  
çiya xwe ji nedim şuna mîxan, û destê xwe  
ji nekim teniştta Wi, bawer nakim.“

**26** Heyşt roj dû re, şagirtên Îsa disa mal de  
bûn. Tomas ji lî tev wan bû. Dema ku deri  
girtî bû, Îsa hat lî nav wan de sekini û got:  
„Selamet ji we re!“ **27** Dû re Tomas re got:  
„Bêçiya xwe dirêj bike û mêze destê mîn  
bike; destê xwe ji dirêj ke û bike teniştta  
mîn; û bêiman nebe, feqet biiman bibe!“

**28** Tomas ji Wi re got: „Xudanê mîn û Xudê  
yê mîn!“

**29** Îsa wi re got: „Te bona ku ez ditim iman  
kîr; feqet xwezi bî wan yê ku neditin û  
iman kîrine!“

**30** Îsa dî ber şagirtên xwe hê pîr mûcize  
çêkîr ku, ew dî vê kitêbê de nehatine nivî-  
sîn. **31** Feqet bona ku hun iman bîkîn, Îsa  
Lawê Xudê Mesih e, û iman bîkîn ku bî  
navê Wi dî we de jîyan hebe, evên ha  
hatine nivîsin.

## Îsa tere cem golê

**21** 1-2 Dû van tîştanre, Îsa dî teniştta  
gola Taberiyê de xwe disa nişanê  
şagirtan da; û ev ji wisa çêbû: Simon  
Petrûs, şagirtê ku jê re „Zo“ dîgotin To-  
mas, ji gundê Celilê yê Kana de Natanyel,  
lawên Zebedî û du tene şagirtên Wi yê  
dî ji bî hev re bûn. **3** Simon Petrûs ji wan  
şagirtên dî re got: „Ez terim girtina ma-  
siyan.“

Wan got: „Em ji lî tev te werin.“ Ew der-  
ketin û siwarê qayixê bûn. Feqet wan wê  
şevê qet masî negirtin. **4** Dema ku bû sibe,  
Îsa teniştta golê de sekini bû. Feqet şagir-  
tan fehm nekîrîn ku, Ew Îsa ye. **5** Îsa ji  
wan re got: „Zarokno, ma xwarînek we  
heye?“

Wan ji Wi re got: „Na“

**6** Îsa ji wan re got: „Torê berdî aliyê  
rastê, hunê bîbin!“ Lî ser vê yekê wan  
berdan, û ji ber pîrbûna masiyan êdî wan  
nekarin ku torê kaş bîkîn. **7** Wê demê şa-  
girtê ku Îsa jê hez kîr, ji Petrûs re got: „Ev  
Xudan e!“

Simon Petrûs, dema ku bihist Ew Xudan e, kirasê xwe li xwe kir (çimki ew tazi bû), û xwe avête golê. **8** Feqet wan şagirtên din, tora masiyan kaş kîrin bi qayixê piçûk hatin. Çimki ew ji reşiyê nêzîki du sed arşinan dûr bûn. **9** Dema ku ew der ketin, wan dit ku agirê komir dişewite, û li ser agir ji masi û nan heyê.

**10** Îsa ji wan re got: „Niha wan masiyê ku we girtine binin.“

**11** Û Simon Petrûs sîwar qayixê bû, tor kaşê reşiyê kir; tam sed û pênc masiyên mezîni li torê de hebûn. Ev qas pîr masi torê de hebûn, dişa ji tor qîş nebû.

**12** Îsa ji wan re got: „Werin, xwarîna sibehê bixwin.“

Qet şagirtêkê cesaret nekîr ku jê pîrs bike û bibêje: „Ma Tu kî yî?“ Çimki wan zanin ku Ew Xudan e.

**13** Îsa hat nan girt, da wan; û wisa masi ji da wan. **14** Îsa piştî ku ji mîrînê rabû, niha ev cara sîsêya bû ku, Wî xwe ji şagirtên xwe re da xuya kîrin ê.

## Îsa, Petrûs û Yûhenna

**15** Bî vi awayî dema ku wan nanê sibê xwar, Îsa ji Simon Petrûs re got: „Ya Simon lawê Yûhenna, ma tu ji van hê pîrtir ji mîni hez dikî?“ Simon Petrûs got: „Erê, ya Xudan, tu zani ku ez ji te hez dikim.“

Îsa ji wî re got: „Bexên mîni biçêrine.“

**16** Îsa cara diduyan dişa jê pîrs kir û got: „Ey lawê Yûhenna Simon, ma tu ji mîni hez dikî?“

Wî ji got: „Erê, ya Xudan, tu zani ku ez ji te hez dikim.“

Îsa ji wî re got: „Miyên mîni biçêrine.“ **17** Îsa cara sîsêyan dişa ji wî re got: „Ey lawê Yûhenna Simon, ma tu ji mîni hez dikî?“

Petrûs ji ber ku cara sîsêyan Îsa ji wî pîrs kir: „Ma tu ji mîni hez dikî?“ Xemgîn bû, û ji wî re got: „Ya Xudan, tu her tiştî dizani; û tu dizani ku, ez ji te hez dikim.“

Îsa ji Petrûs re got: „Miyên mîni biçêrine.“

**18** Ji te re bî rasti bî rasti dibêjim: „Xortiya xwe de te xwe bî xwe girê dîda û kû ve bixwestana tê biçûwayî wê derê. Feqet dema ku tu kal bibî tê destê xwe dirêj bîki,

yekê dîn wê te girê bîde û te bibe şunda ku tu nexwazi heri.“ **19** Îsa, ji bo îşaret kirinê ev got ku (Petrûs) bî mîrînek çawa Xudê bîlînd bike. Dû re ji wî re got: „Lî dû mîn were.“

**20** Petrûs mêze paş xwe kir û dit ku ew şagirtê ku Îsa jê hez dikir lî dû wan dihat. Ew şagirt yê ku dema wan şiv dixwarin, xwe dabû ber singê Îsa û got: „Ya Xudan, ewê ku te bîde dest ki ye?“ Ev ew e.

**21** Petrûs ew dit û ji Îsa re got: „Ya Xudan, ma ev ji wê bibe çî?“

**22** Îsa ji wî re got: „Eger ku ez bixwazim ew bisekîne heta ku ez werim, ma te çî ji vi ye? (Ma ji te re çî?) „Tû lî dû mîn were!“

**23** Bî vi awayî: Lî nav bîran de gotin derket ku, „ew şagirt namîr e.“ Feqet Îsa negotîbû wî: „Ku ew namîr e.“ Lê belê Wî tenê got ku: „Eger ku ez bixwazim ew bisekîne heta ku ez werim, ma te çî ji vi ye?“ (Ma ji te re çî?)

**24** Yê ku ji van tiştan re şehadeti kiriyê û ev tiştên ha nivisiye, şagirt ev e; û em dîzanin ku şehadetiya wî rast e.

**25** Hê pîr tiştê dîn yê ku Îsa çêkirin hene.

Ez bawerim ku, eger ew yek bî yek bîhatana nivisin, kitêbê ku bîhatana nivisandin heta ko dînê de ji cih nedibûn.